

05 P.T




TEKOŞER



Hejmar 26

Kanûn 1984



revue trimestrielle

driemaandelijks blad

TÊKOŞER: KOVARA TÊKOŞER, YEKÎTIYA KARKER Û XWENDEKARÊN KURD LI BELÇIKA

NAVNÎŞAN: TÊKOŞER
B.P. 33
1730 ZELLIK
BELGIQUE

BUHA: 40 F.B., 2 IM, 6 FF.

ABONETÎ: 160 F.B.

N° BANKÊ: 426-3144071-85
K. B.
BELGIQUE

BERPIRSIYAR: M. Nezh YALÇIN

KOMÎTA NIVÎSKARIYÊ: Ahmed, Derwêş, Pervîn, Yalçin

KARÊN TEKNÎKÎ: Pascale DESRUMAUX

TÊDAYÎ

DIVÊ KU EM NIVÎSKARAN BIGHÎNIN	Dr. Poloço	R. 3
CIGERXWÎN ÇÛ DILOVANIYÊ	Mihdî	R. 4
COGRAFYA KURDISTANÊ DI ANSÎKLOPÊDIYA ISLAMÊ DE		R. 6
STRANEK GELERÎ: XERABO		R. 12
DEPREMA ERZURÛMÊ	Bira	R. 13
TÊGIHEŞTINA ÇÎROKÊN GEL	Torî	R. 15
INLEYEREK AKIYOR DICLE ILE FIRAT	Bira	R. 19
KURDISTAN, ÇEND NOT LI SER JÎNA ABORÎ Û ÇANDÎ	Pervîn	R. 21
XEWNA NE BI XÊR	Firat Cewerî	R. 23
DÎROKA KURD Û KURDISTAN	Derwêş	R. 24
HEVPEYVÎNEK BI Dr. QASIMLO RE		R. 26
KONSERA KURDÎ-TIRKÎ LI BRUKSEL		R. 28
BRÛKSEL'DE KÛRT-TÛRK KONSERI		R. 29
SERBUHURIYEK BI YILMAZ GÜNEY RE	Torî	R. 30
XEBATA ME		R. 32
KUŞTINA KARKERÊN KURD Û TIRK LI FRANSA		R. 33
TÊKOŞER'DEN HABERLER		R. 34
AVRUPAYA DINI GOÇ	Yalçin	R. 35
HEVPEYVÎNEK	Derwêş	R. 36

DIVÊ KU EM NIVÎSKARAN BİGHÎNÎN

Dr. Poloço

Dibe ku ev sernava jorîn pirsinan di serê hinan de bihêle. Ew karin wilo bipirsin: "Ma ku nivîskar tunebin, emê çawan nivîskaran bighînin û derbixînin?". Rast e, divê ku tiştek di ortê de hebe, ku mirov karibe wî tiştî bi pêş de bibe û bighîne. Lê ê me, me heya bi niha guh nedaye vê yeka han. Xort ji nav me derketine, nivîsîne, kal bûne û mirine jî, me bi qasî qirşekî guh neda ye wan, piştgirtiya wan nekirine û ew her bi serê wan û bi tenê hiştine. Ji dêlva ku em piştgirtî û alîkariya wan bikin, me dev avêtiye wan û ew nebaş nîşan dane. Hîn jî çend heb ji xortan me yê wê demê dijîn. Van xortan me yê wê demê, ku niha kalbûne û li bendî mirina xwe rawestane, gelo ku bimirin û ji nav me bar bikin, ka ewê ji me re çi bihêlin? Ka wan bi çendan roman, çîrok, piyes û hwd... nivîsîn? An ku romaneke me ya edebî, ku em karibin bidine ber romanên cîhanî, heye? An çend çîrokên me yê edebî, ku em karibin pê qayîşê bi çîrokên cîhanê re bixînin, hene? No, yê min ez heya bi niha tiştêkî welê nabînim. Ez romaneke welê ku xwendevanên biyanî karibin pê me û jiyana me nas bikin, nabînim. Çima? Ma qey em kurd kêmi xelkê ne? Ma qey mêjiyê me weke yê xelkê bi pêş neke-tiye? Belê, em weke wan in û mêjiyê me jî weke yê wan bi pêş ketiye. Lê çima em dom bi nivîsandinê nakin û weke xelkê bi dehan, bi bîstan pirtûkên hêja û bi naverok li dû xwe nahêlin? Gelo ev sûcê kê ye? Sûcê nivîskarên me ne, sûcê gel e, sûcê ronakbîrê me ne, sûcê grûp û partiyên me ne, an jî sûcê dijminên me ne? Tu bêjî nebêjî sûcê mezin yê dijmin e. Lê grûp û partiyên me jî di vê de ne bê sûc in.

Em vegerin ser nivîskarên me yê xort, yê dema Hawarê. Ku em li peyaki nola N. Zaza û Osman Sebrî xwedî derketibûna, dê rewşa wan niha çibiwa? Ew kabîliyeta ku di xortaniya wan de bi wan re hebû, dê niha çiqasî bi pêş ketibiwana? Bi a min ku xwediyên wan hebîwana alîkarî bi wan hatibiwa kirin, xatirê wan hati-biwa girtin, kezeba wan nehatibiwa reşkirin, reklam û propaganda wan hatibiwa kirin, navê wan dê niha di rex navên nivîskarên dinyayê de bi-

hata dîtin. Bi qasî ku em niha ji ber wan serbilind in, emê deh qatan serbilindtir bibiwana.

Divê ku em li nivîskarên xwe xwedî derkevin. Em ji her alf de alîkariya wan bikin. Em pirtûkên wan çap bikin û belav bikin. Alîkariya wan ya diravîn bikin, moral bidine wan, propaganda wan bikin û wan bi gel bidine naskirin. Gava ku em vê yeka han ji wan re bikin, ez bawer im ku ewê ji dil û giyan binivîsin, bi gel re bibin yek û dê edebiyateke me ya hêja û nemir derkeve meydanê. Emê bi vî awayî nivîskarên hêja, ku karibin qayîşê bi nivîskarên dinyayê re bixînin, ji nav xwe derbixînin. Di vir de çend gotinên Lenî di derheqa edebiyatê de, hate bîra min. Nivîskarekî bi navê Aleksander Serafimoviç rojekê dihare mala Lenî ku wî ziyaret bike. Piştî ku hebekî dipeyivin û sohbetê dikin, Lenî jê dipirse:

- Tu vê demê li ser tiştêkî dixebitî?

Serafimoviç:

- Niha nivîsandin zor e, dema tevgerê xurt e.

Lenî:

- Erê, niha li welatê me dema tevgerê xurt e. Lê hun nivîskar divê ku karkeran hînî xebatên xwe yê edebî bikin. Ji bo vê yekê divê ku hun pir bixebitin. Her destpêkirineke karkeran fî biçûk divê ku hun karekî mezin bibînin. Di kovara we de nivîsên karkeran jî çap dibin?

- Ne zêde, Vladimir Iliç. Divê ku em kêmasiya kultur û zanabûna wan jî bidine ber çawan.

Lênî bi rûkenî lê nihêrî û got:

- Lê xem nake. Ewê hînî nivîsandinê bibin û ewê edebiyateke me ya hêja û nemir pêk bê.

Lenî bi xwe pir guh dida huner û edebiyatê. Wî rola huner û edebiyatê di têkoşna gelê Îris de, roleke mezin didî. Wî bi xwe edebiyat dixwend û têkiliyê xwe qet ji nivîskaran nedibîrî. Di nameyên xwe de, yê ku ji nivîskaran re şandiye, di civat û civnan de her qala girîngbûn û hêjabûna edebiyat û hunerê kiriye.

CIGERXWÎN ÇÛ DÎLOVANIYÊ

Mihdî

Şervanê gelê kurd, Cigerxwîn, di roja 22yê Cotmehê, saet 03.00 de, li Swêdê, bajarê Stokholmê, çû dîlovaniyê

Ji bo taziya wî, di sisiyê meha Mijdarê, roja Şemiyê, saet 12 de, di salona Tensta de, li Stokholmê, gelek kes hati bûn. Nûnerê Têkoşer jî amade bû. Di saet 12.30 de, cenaza Seyda hat anîn û herkes jî bo wî rabû piya. Piştî çend deqqan, gelek silavname ku rêxistin û merivên naskirî şandi bûn hatin xwendin. Paşê, lawê wî li ser jîna bavê xwe peyivî û nûnerên Federasyona Kurdên Swêdê û P.S.K.S. (partiyek li Kurdistanê Sûriyê) axaft.

Li dawiyê, hemî kes, yek bi yek, cenaza Seyda Cigerxwîn silav kir, berê ku wê bibin meydana balefiran.

Roja Yekşemê, 4ê meha Mijdarê, cenaza wî, li ser daxwaziya wî, hat şandin bajarê Qamişli, li Kurdistanê Sûriyê.

Navê Cigerxwîn ê rast Şêxmûsê Hesên e. Ew di sala 1903 de, li Kurdistanê Bakur (Tirkîyê), gundê Hesarê, qeza Kercosê, hati bû dinê. Ew yanzê salî bû dema ku çû Kurdistanê Sûriyê, bajarê Amûdê. Li wê derê, piştî xwendina xwe, bû mele. Lê meletiya wî pîr ne kişand. Wî jî meletiyê zû berda û dest bi cotkariyê kir.

Şêxmûs hîn xort bû, lê wî di xortaniya xwe de, weka gelek zarokên Kurdan, gelek zorî û xizanî (feqîrî) dîtî bû, gund û bajarên Kurdistanê Tirkîyê, Îranê û Iraqê geriya bû. Kurdistanê Kurdan, Kurdistanê perçeperçe, anî bû ber çavên xwe. Derdê gel, derdê welêt, dil û hinavê wî lişewitandin. Ji sedema vî derdî, wî navê xwe kiri bû Cigerxwîn û bû bû mezintirînê helbestvanên gelerî yê welêt. Cigerxwîn biryar stendi bû ku heta mirina xwe xizmeta gelê xwe bike. Loma wî, heta dawiya temenê (emr) xwe, di her warî de nivîsî bû: helbest, rêziman, dîrok, nivîsarên siyasi

Ji bo ku Cigerxwîn jî nav gel derketi bû û derd û kulên wî baş zanî bû, wî bi zîmanê gelê xwe dinivîsî û bangî wî dikir ku hişyar bibe, rabe piya û bibe yek. Li gora zanîna me, heta nuha heft dîwanên wî yê çapkîrî hene û helbestên wî îro li çar aliyên Kurdistanê, di bajar û gundan de, di devê mezinan, xortan û zarokan de ne. Hîn gelek eserên wî yê ne çapkîrî jî hene.

Di sala 1927 de, wî di weşana "Xoybûn" de cih girt. Ew rêxistinê yek jî rêxistinên gelê kurd ên yekemîn bû. Piştî çend salan, di 1930 de, Cigerxwîn û çend xortên welatparêz bi Celadet Bedir Xan re kovara HAWARÊ weşand. Ev kovara giranbuha jî sala 1932 heta 1935 û jî 1941 heta 1943 (57 hejmar), bi tîpên latînî derket û li ser zîman û bêjeya kurdî tesfîreke pîr mezin kir.

Cigerxwîn pîr caran sergom bû bû û reviya bû welatên din. Bi salan li Libnanê bi dizî ma. Berî 1971, wî di şoreşa Kurdistanê Iraqê de cih girt. Di sala 1971 de, gava ku Kurdan mafê otonomiyê stand, wî li zanîngeha mezin a Baxdayê mamostatiya zîman û bêjeya kurdî kir.

Di sala 1979 de, Cigerxwîn iltica kir Swêdê û li wira jîna û xebata xwe heta dawiyê ajot. Berpirsiyarên hikûmeta Swêdê jê pirsîn: "Çima te di vî emrî de welatê xwe berda û tu hatî van deran?". Bersiva Cigerxwîn ev bû: "Ez zanim ku li vê derê ezê bi serbestî karibim bi zîmanê xwe bixwînim û binivîsim, bê ku kesek were mala min û pirtûkê min bibe û bişewitîne".

Kîme ez ?

Kurdê Kurdistan

Tev Şoreş û volqan

Tev dînamêtîm

Agir û pêtim

Sorim wek etûn

Agir giha qepsûn

Gava biteqim

Dinya dihejî

Ev pêt û agir

Dijmin dikuji

Kîme ez ?

Ezim rojhilat

Tev birc û kelat

Tev bajar û gund

Tev zinar û lat

Ji destê dijmin :

Dijminê xwînxwar

Xurt û koledar

Ji rom, ji fireng

Di rojên pir teng

Bi kuştin û ceng

Parast, parast

Parast min ev rojhilat

Kîme ez ?

Rojhilatê nêzîk

Rojhilatê navî

Ev bajar û gund

Ev bej û avî

Ket bin destê min

Pî da ser dijmin

Min bi ceng û şer

Zanîn û hiner

Piştî wî şikand

Serî lê gerand

Ez bûm padîşah

Xurt û serbilind

Ketin destê min ta sînorê Hind

Kîme ez ?

Cigerxwîn

KÎME EZ

DÎWANA.. III

.. 1973

COGRAFYA KURDISTANÊ

DI ANSÎKLOPÊDIYA ÎSLAMÊ DE ★

- I

1. TABYET

Çiya

Bi awakî giştî, Kurdistan welatekî çiyayên bilind e. Heykela wî, di perça wî ya tirkî de, ji zincîrên Torosê Rojavayê yê cihê ava bûye. Ev zincîr, pîrr zû, ji keviyên (kenarên) Deryayê Sipî, nêzîkî Xelîcê Iskenderonê, dest bi xuyakirinê dîkin, û di pêşiyê de, ber bi Rojhilata Bakur bilind dibin. Li Bakurê Marasê, ew çeçelekê ava dîkin. Xêza vê çeçelê ya jorîn ji destpêka çiyayên Engirek û Nuruhakê (3090 m) dizivire, bi çiyayê Akra dewam dike, digihêje zincîrên çiyayên Munzur (3088m), Mercan û Kargaparaz (3.388 m.), û paşê xwar dibe, xwe bi zincîra çiyayî ya Aras digre û di dawiyê de digihêje sistema Araratê.

Ji destpêka riya me de, zincîreke duyemîn, weka nîvhîveke ku pîrr baş baş xuya ye, ji Başûrê Malatyê diçe, bi çiyayên Maden, serên Haçreş (2689 m.) û Sasûn (2.590 m.), li Başûrê Mûşê, dewam dike, û di bilindbûna xwe de, bi çiyayên Bitlis û Hekkarî (3.630 m.) û bi çiyayê Çilo ku bi serê Reşko (4.170 m.) diqede, diçe Başûrê gola Wanê.

Di nav bera van her du xêzan de, mersefa ku jê re mersefa Ermenî gotine û ku bilindbûna wê ji 1500-1000 m. nizimtir nabe cih digre. Ji xwe, zincîrên ku di dirêjayiya (paralêl) kenarê Bakurê ne, weka çiyayên Çakmakê, di sewiyeke bilind de dimînin. Û li Başûrê Erzurûmê jî, sistema burkanî (volkanî) ya çiyayê Palendöken (3.124 m.) û li Başûrê wî tevayiya çiyayên Bingol û Şerafeddin û ber bi Rojhilatê bêtir, bilindiyên Tuncelî, ev kela tabîî ya Dersîmê ava dîkin. Di vê kîtla zinaran de, weka Krîstal, çemê Feratê newalên kûr kolaye, û çiyayên bi kêlekên dijwar ji van mañzerên ku meriv nikare bigihêje wan re awayên pîrr ecêb dîdin. Lê, destên xweşikên dewlemend heta Bakurê Malatyê (915 m.), Roj-

hilata Başûrê Elazigê (1.020 m.) û Bakurê Mûşê (1.500 m.) dirêj dibin. Li dirêjayiya vê birfina anatolî, gelek hejanên erdê (zelzele) navçeyê dihejînin û pîrr zerer tînin. Em hejanên Erzincanê, di 1939 de, ku 25.000 mirî çêkirin, ên ji wan siviktir, ên Varto di 1966, û Bingolê û Gencê di 1971 de, bînin bîra we.

Li başûrê xwarbûna Torosê, navçeyên firehên pan ên Adiyaman, Urfa (550 m.), Diyarbêkrê (650 m.), ji nişka ve, bi xwarbûna 3.000 m., ber bi Mezopotamyê peya dibin, lê çend cihên bilind jî dihêlin, weka serê burkanî yê çiyayê Karaca (1.915 m.) û zincîra Tûr Abdîn ku ji Mêrdînê (1.130 m) dirêj dibe û li Rojhilatê xwe bi çiyayên pîrr bilintir ên Herakol (2.943 m.) û Cûdî (2.089 m.) digre.

Li Rojhilata dûrtirîn û bêtir li Bakurê, nuqta paldana çiyayê Agirî (Ararat) ê mezin (5.165 m.) û a Agiriyê piçûk (3.925 m.) weka mihwera sistemeke çiyayîyeke nuh tê dîtin. Bi rastî, ji vê navendê, gelek nuqte derdikevin û, li Bakurê bi zincîra Tendureka pîrr mezin (3.313 m.) û a Ala Dag (3.255 m.), li Rojhilatê, bi çiyayên Kuh (2.850 m.), Mengene (3.610 m.) û Ispiriz (3.537 m.), û li Başûrê, bi çiyayê Vaviran (3.550m) û zincîra Şatak, dora gola Wanê digrin. Ji xeynî her du Agiriyên ku sedema damezrana wan kelanên burkanîyên pîrr kevn e, du burkanên naskirî li ser gola Wanê hene: li Bakurê, Sîpan (nêzîkî 4.434 m.) û xasma çiyayê Nemrûd ku kêleka wî ya bilintirîn digihêje 3.140 m. û ku firehbûna serê wî yê burkanî digihêje 6.400 m., û di hundurê wî de goleke bi ava xweş û ku bilindbûna wê digihêje 2.552 m. Hemî ev navçeya Başûrê gola Wanê ku bilindbûna wê bi xwe digihêje 1.720 m., bi tevayiya xwe perça rûniştina Kurdên Tirkîyê a bilintirîn e.

★ Encyclopédie de l'islam (çapa nû), 1981, Tom V, rûpel 443-446, Paris, Editions G.-P. Maisonneuve & Larose.


Wergêrandin: fransîzî-kurdî: Pervîn.

Ji alfkî din jî, zincîrên çiyayên din jî xwe girêdidin Agirî; ew berê xwe, rast bi rast, didin Bakur-Başûrê, nav bera golên Wanê û Urmiyê, û bi vî awayî, Kurdistanî Tirkîyê jî Kurdistanî Iranê vediqetînin. Piştî ku ew xwe digihênin girêka pîr dijwar, ku meriv nikare hilkişê wê, ya navçeya Harkî-Oramar, ew ber bi Rojavaya Başûrê xwe xwar dikin û bi vî awayî zincîra mezin a Zagrosê ava dikin. Ev zincîr, bi tevayîyeke xêzine "paralêl", perçeyên Kurdistanê, bi pareke mezin, ava dike: aliyên wê yê Rojhilatê li Iranê û yê Rojavayê li Iraqê. Weka ku C.J. Edmonds nîşan dide, her gav ne hêsan e ku meriv navekî jî herkes re naskirî bide zincîrên cihê, ji bo ku navên wan li gora cihên ku nûçedan tê de ne diguherin: ev yan ew kêleka çiyê, nêzîkî serîkî çiyê, gelf yan gundekî naskirîtir û yan goreke (mezal) şexekî binav û deng.

Li Iranê, zincîrên ku dū hev de derin û ku berê xwe didin Rojavaya Bakur-Rojhilata Başûrê hene. Gelek saxên wan yê bi rêzê paralêl jî hene. Em, di riya xwe de, çend serên wan ên bilintirîn nîşan bidin: Dalenpar (3.748 m.), li nivê sêkuçka sê sînoran: ên tirkî, iraqî û iranî; Spîraz, Kandîl yan Kogiz (3.782 m.), Galala (3.364 m.); ber bi Rojhilatê bêtir, Çehel Çeşme (çil kanî) (3.416 m.) ku keleke avê ya Kurdistanî Ira-

nê ya rast e; ber bi Başûrê bêtir, zincîra Hawraman (3.216 m.) û a Cîlo ku bilindbûna wê ya navîn 3.500 m. ye, heta çiyayên Lûrîstanê û Puştî Kuh.

Li aliyê Iraqê, li Başûrê sînorî tirkî, bi dewama zincîrên çiyayê Cûdî, Seman û Cîlo, lê di eynî zemanî de jî bi nizimbûneke nerm, ber bi deştên Mêzopotamya, nav bera Dicle û Zabê Mezin, zincîrên Bêxaîr, Matîna û Gara, û nêzîkî sînorî Iranê, piştî Zabê, çiyayên Serî Korawa (3.603 m.), Dolareş (3.449 m.) û Xuwarabtê (3168 m.) hene. Di vî navçeya Bradostê de, eger zincîrên sînorî bilind bin jî, weka çiyayê Halgurd (4.013 m.), ew gava ku ji deştan nêzîk dibin nizm dibin. Bi vî awayî, bilindbûna çiyayê Handrîn li Rojhilata Başûrê Rawendûzê bi tenê 2.793 m. ye. Gava ku meriv tavil Zabê Piçûk dibihure, zincîr, bi paralêl, ji hestiyê piştî Zagrosê dirêj dibin. Di xêza Kurakacaw-Gocar-Kurkur-Asîs de gelek serî, di nav bera 2.950 û 1.960 m. de, hene. Xêzeke din, Azmir-Karasîrd, ji ya din nizmtir e: di nav bera 1.870 û 1.608 m. Lê, li Rojavaya Bakurê Sileymaniyê, serê bilindê Pîra Magrun (3.183 m.) xuya dibe. Zincîreke dawîn û paralêl, Bingîrd-Beranan, cardin çend sed metre nizm dibe (nav bera 1.739 û 1.477 m.). Ber bi Rojhilatê bêtir, zincîra dirêj a Karadag (Çiyayê Reş) (1.378-2.017 m.),



Wêne: Pierre RONDOT, Destin du Proche-Orient, r.271, 1959

ê bi geliyên cihê, ji vira û şûn de welatê bilind ê deştan vediqetîne. Ev deşt, bê manf, ber bi Altun Köprü, Kerkûk û Tawk dirêj dibin, û ber bi Rojhilatê bêtir, çiyayên Hamrîn (1.640 m.) dora van deştan digrin û wan radiwestînin. Ev çiya berê xwe didin Rojhilata Başûr-Rojavaya Bakurê û çemên Diyala, Sirwan û, li dawiyê, Feratê, nêzîkî gihaştina Zabê Piçûk, dibuhurin.

Li ser de jî, pêwist e em çiyayê Sincar ku yezîdiyên ku Kurdên rast in tê de rûdinên nîşan bidin, herçend e perçekirina idariya nuh a Iraqê wî li derveyî Kurdistanê dihêle. Ev zîncîra ku dirêjbûna wê 60 km, firehbûna wê 15 km, û bilindbûna wê nêzîkî 1.600 m. ye, li Mêzopotamyê, li Rojavaya Mûsilê û di eynî dereca firehbûna wê de cih stendiye.

Çem


Eger Kurdistan welatekî pîrr çiyayî be jî, ew bi awakî zengîn ji aliyê gelek kaniyên zelal, riyên avê û çemên rast tê av dan.

Em di destpêkê de Aras nîşan bidin. Ew kaniya xwe ji hundurê Kurdistanê, ji mersefa Bingolê, Hezar Gol, ji navbera Dicle û Feratê, distîne. Lê, di eksê van her du çemên ku ber bi Rojavaya Başûrê diçin, ew, di destpêkê de, ber bi Bakurê diçe, paşê ber bi Rojhilatê xwar dibe û derbas dibe Ermenistana Sovyêti.

Her du çemên mezinên ku menzera wan pîrr xweş e, ewê, bi hêzanî, ji Kurdistanê derbas bibin: Feratê, ji du milên bingehî ku dora navçeyeke fireheke kurdî digrin ava bûye; şaxa jorîn, Kara Su (450 km), di destpêkê de, ji gelek kaniyên ku ji çiyayê Dumlu hatine ava bûye; paşê, ew di deşta Erzurûmê de diçe. Li wira, ew kaniyên ku li çiyayê Çoruh dipijiqin distîne, ruyê xwe dide Rojavayê, di geliyên teng de, Erzincanê av dide, ber bi Başûrê xwar dibe û, bi awakî ne muntezem, weka maran, diçe her alf, Kemahê av dide, derbas dibe Kemalîyê, li her der, li çiyayên ku riya wî digrin dikeve, jî bo ku hinek li Başûrê Ergilê bigihêje şaxa xwe ya jêrîn, ango Murad Su (650 km) ku kaniya xwe ji Bakurê gola Wanê, li piyê çiyayên burkanî yên Ala Dag û Tendurek distîne; Murad Su hinek hildikişe Bakurê, derbas dibe Diyadin û Karakose, ji nuh de diçe Başûrê û Tutak û Malazgirt av dide, û paşê, her gav weka maran, derbas di-

bê Bakurê Mûşê, av dide Genc, Palo û Pertek, ji bo ku, di dawiyê de, li Başûrê Kebanê, bigihêje şaxa jorîn. Ji nuha û pê de, her du mil Feratê bi xwe ava dikin. Şaxa sereke (bi tenê) a giring a keviya rastê ya Kara Su Tohma Su ye (194 km) û ew digihêje Bakurê Malatyê û paşê diçe derveyê Kurdistanê. Lê, Murad Su gelek şaxên wî hene ku, weka Perî Su (235 km), bi şaxên xwe yên piçûk, dora Kurdistanê bi carek digrin; tu gund tu car ji riyeke avê pîrr dîr namîne.

Dicle, çema mezina din a navçeyê (1.718 km), di riya xwe ya jorîn de Kurdistanê av dide. Ew kaniya xwe ji navçeya gola Hezarê, li Bakurê çiyayên Maden, distîne û di dirêjahiya 300 km de, li Kurdistanê Tirkîyê, bajarên ku di dîroka kurdî de binav û deng in: Erganî, Diyarbekir, Hasankeyf û Cizre, av dide. Gelek şaxên wî, hemî li çepê wî: Anbar, Batman, Gurza û, bi hêzanî, Botan (226 km) welêt dewlemend dikin. Ew sînora Iraqê, li pêş-Xabûrê, derbas dibe û li wira digihêje şaxa xwe, Xabûr, ku şaxa wî ya piçûk, Hazil, Zaxo baş av dide. Li wira, şebekeke çemên xweşik ava dibe. Hemî şaxên Diclê ne, lê çemên rast in. Di destpêkê de, Zabê Mezin (392 km) ku kaniya xwe ji Tirkîyê, çiyayê Mergenê, di nav golên Wan û Rezayê, distîne. Ew Culamarg, paşê, li Iraqê, navçeyên Zibar û Barzan av dide. Yek ji şaxên wî jî bajarê Rawendûz ê pîrr xweşik av dide. Ew, piştî 45 km ji Başûrê Mawsilê digihêje Diclê. Zabê Piçûk (400 km) kaniya wî li Îranê ye, nêzîkî Lahîcanê, welatê golan. Şaxên wî pîrr in, li Îranê û li Iraqê. Piştî ku ew Taktak û Altun Kopru av dide, digihêje Diclê. Di riya wî ya jêrîn de, li Dukanê, barajeke pîrr mezin ku hêza wê 7 milyon m³ û aqara wê 50 km² ye, di sala 1958 de qediya. Amanca avakirina wê, di destpêkê de ava Diclê ku carina bilindbûna wê pîrr bi tehlike ye muntazamkirin bû. Lê, li ser de jî, avdana nêzîkî 350.000 hêktar erd bû. Fabrikeke hîdro-elektrîkeke giring bi hêza 200.000 kw, li navçeya Çamçamalê, heye û tê gotin ku ew ji navçeyên kurdî yên Iraqê re otonomiya wan a ênêrjiyê dide. Adhaym (230 km) ku ji nêzîkî Bazyanê tê, bi şaxên xwe yên cihê Kerkûk, Dakuk Tuz û Xurmatu av dide û berê ku xwe bavêje Diclê, 30 km li Başûrê Baxdayê, ji çiyayên Hamrînê derbas dibe. Di dawiyê de, Diyala (386 km) ku kaniya xwe ji çiyayên sînora Irak û Îranê distîne



Wêne: Wan. Elisée RECLUS, Géographie Universelle, r.373, 1884

heye; li Iraqê, kaniya wî ya bingehî Tancarû, ku deşta Şehrezorê av dide, ye, û li Îranê, kaniya Sîrwan ku li Lûrîstanê çêbûye ye. Li Iraqê, piştî Derbendî Xan ku tê de barajeke mezin ku ji bo avdanê hatiye ava kirin, ev her du şax Diyala ava dikin. Diyala jî nêzîkî Başûrê Baxdayê xwe davêje nav Diclê.

Kurdîstana Îranê jî jê gelek çemên ku pîrr ji wan kaniya xwe ji Çihil Çeşme (Çil Kanî), çiyakî mezin (2085 m) li welatê Mukrî, distînin, derbas dibin. Nîşandana Kezel Uzun ku şaxên wî yê cihê hemî welatê Ardelanê av didin bes e. Ji xeynî wî jî Cagatu (240 km) û Tatahu xwe davêjin nav gola Rezayê.

Weka çiyân, çemên Kurdîstanê karin, li gora navçeya ku jê derbas dibin, navê xwe biguherînin. Gelek riyên avê jî navê gundê bingehî ku jê derbas dibin distînin.

Gol

Li Kurdîstanê çend gol jî hene. Mezintirîna wan gola Wanê ye. Bilindbûna wê 1.700 m. û aqara wê 3.700 m² ye. Ava wê şor e, ji sedema barajeke burkanî ku li keviyên wê karbonat û sulfatê soda datîne. Tê de celebekî tenê yê masiyan, "inci baligi" ê mezin û ku rengê wan diguhere, tê girtin. Li Bakurê gola Wanê, gola Nazik û li Rojhilata Bakurê Wanê, gola Er-

cek, hene. Li Bakurê bêtir, gola Balik, li Rojhilata Karakose heye. Li kaniyên Diclê, li Rojavaya Bakurê Maden, gola Hazara kûr û a ku aqara wê nêzîkî 50 km² ye heye. Ava wê şor e û jê masî "yılan baligi" tê girtin. Li Îranê, em karin gola Urmiyê ku gelheyên kurd li dora wê dijîn nîşan bidin. Ev ji gola Wanê firehtir e (5.700 km²), dirêjbûna wê 130 km û di hin cihan de firehbûna wê 40 km ye; ew ji Deryayê Mirî şortir e; tu masî nikare tê de bijî. Ji wira ne dûr û li Başûrê, du golên piçûk, Gola Sor û Deryaçef Kopî, hene. Li sînora Iraqê, li Rojavaya Marivan û li Rojhilata Başûrê Penciwînê, gola Zrêbar heye. Li Kurdîstana Iraqê tu gol tu nene.

İklîm

Ji sedema bilindbûna Kurdîstanê, iklîma wê dijwar e. Berf serên çiyayên bilind, bi mehan, digre. Helanbûna wê li gora navçeyan diguhere. Di deştan de, ketina baranan di nav bera 200 û 400 mm. ye, lê, li mersefan yan di nav bera zincîrên çiyayên cihê de, ev kûrbûn digihêje 700-2000 mm û heta 3000 mm. Di geliyên Kurdîstana navîn de, iklîm kit'eyî (continental) e û heta bêav e. Carina, çend meh bê dilopeke av derbas dibin.

Weka iklîmê, dereca germbûnê jî pîrr diguhere. Ew, li Karakose, li Bakurê, di zivîstanê de, kare bikeve

-30/35° û li Başûrê, li Kermanshahê, kare hilkişê +35/45°. Li Kurdîstana Îranê ku iklîma wê kit'eyî û hişk e, ferqa dereca germbûn û sarbûnê pîrr mezîna e: -22° û +32°. Bi awakî giştî, dereca germbûna kêlekên Zagrosê yê Rôjhilatê ji kêlekên Rojavayê çêtir e: li Senna, di meha çilê de -15° û di meha temmûzê de +41,8° ye; li Kerkûkê +14,5° û +43° ye. Li Rojavayê bêtir, di çile û temmûzê de, li Malatyê: -1,5° û +26,5°; li Urfê: +4,5° û +32°; li Diyarbekrê: +2,5° û +31°; li Wanê: -3,5° û +22,5°.

2. TABIETA KU DÎJÎ

Şînayî

Iklîma Kurdîstanê çiqas hişk be jî, ew ne çol e û çiyayên wê bi zozan û şînayî, geliyên wê bi daristan û mêrgên ku hemî, di beharê de, bi gulên rengareng xemilîna hatine girtin. Bi vî awayî, li Kurdîstana Tirkîyê 10 mîlyon hêktar daristan, li Kurdîstana Îranê 4 mîlyon û li Kurdîstana Iraqê 1.720.000 mîlyon hene. Ji wan jî 50 km² ên darên çam in. Dara berû ku jê 15 celeb hatine jîmartin giringtirîna daran e. Ew, he- ta di bilindiya 2.700 m. pîrr tê dîtin. Piştî wê, çam û darên dinên lihev badayî tînin. Ji xwe, daristan ne her gav asê û tarî ne. Pîrr caran, ew weka erdên tenha ku tê de darên guhîj hene ne. Darên bî û bi hêzanî ên spîndar li keviyên avan pîrr in.

Li çiya, zozanên havîniyên bilind bi kîlometran dirêj dibin û tê de keriyên bizin û mêşin diçêrin. Li her der, çiyayên hov ên ku tînin xwarin û ku şivanên piçûk li wan digerin û çiyayên besît û tabîî ku jî- nê nê pîr bi gelek hurmet diçînin he- ne. Çiqas gul hene ku, di beharê de, her perçeke erd bi awakî dewlemend digrin û ku zengîniya wan meriv pîrr şaş dîke û bîna wan wî serxweş dîke. Ev şînayî hemî ji me re naskirî ye, ji bo ku celebên wê li Ewropa hene, û merivên ku li Kurdîstanê geriyane navên wan gotine (nîşe: C.J. Rich, cild I, rûpel 284; Bischof, c. I, r. 290-1, 343, c. II, r. 12, 14, 115; Lynch, c. I, r. 181, 190-1, c. II, r. 208, 248, 253, 256, 265, 268, 269, 303, 362, 369, 239, 241, 242, 382; Fr. Stark, r. 257, 273, 330; Hamilton, r. 141-3; Balsan,).

Ziraet

Birek bitenê ji erdên kurdî ku tînin

ajotin bi maddên çandinê û zad tînin nixumandin (girtin). Eger li Tirkîyê 25 mîlyon hêktar erdên ziraf hebin, bitenê 30% ji wan tînin çandin û ji wan 30% jî 1/3 her sal beyar (bê çandin) dimîne (Esenkova, r.108). Li Kurdîstana Îranê, ji 5 mîlyon hêktar erdên çandinê, 24% hatine çandin û 16% bê çandin mane (Qasimlo, r. 90). Li qezayên Kurdîstana Iraqê yê cihê û ku aqara wan a çandinê nêzîkî 8 mîlyon hêktar e, 1/4 tînin çandin (Xosbak, r.43). Li gel vê qasê, çandîna toy li Kurdîs- tanê, bi pareke baş, dikeve abora van welatan: 15% li Tirkîyê, 35% li Îranê, li Iraqê 50% ji genim û 15% ji ceh (Qasimlo, r.89, N°6). Li ser de jî, çandîna birinc ji Iraqê re 1/3ê produksyona (ürün) wê dide. Li ba van maddên ziraf yê xwarinê, pembû û pincar ku nuh ketine ziraetê karekî baş tînin. Tutunê çêtirîn e Tirkîyê û Iraqê li Kurdîstanê tînin çandin. Û Kurdîstana Iraqê nêzîkî tevayîya vî tutunî dide Iraqê (Xos- bak, r.45; Durra, 1963, r.226; 1966, r.245). Eger tîrî li gelek deran, li Tirkîyê, Iraqê û Iranê şîna dibe, ew bitenê li Kurdîstanê, li ser giran pîrr şîna dibe; li Iraqê, 12 mîlyon şîtil hene (Vernier, r.468), û ce- lebên tîrî pîrr û cihê ne (navên wan di Hawarê, N° 34, r.8; Wahby, Rêzi- man, r.148 de hene). Hin ji wan ji bo amadekirina mewijên ku di xwarinê de pîrr tînin bi kar anîn tînin hiş- tin. Darên meywan (fêkiyan) jî li Kurdîstanê pîrr in: hinar, şeftalî, sêv, hijîr, zerdalî, gwîzên sedansa- lî. Çandîna şînayiyê pêş de diçe, li dora gundan û heta li çiyên ku li ser wan Kurd, bexçevanê bijîr, benên ku bi dîwarên piçûk hatine girtin ava dîke, ji bo ku tu perçe- ke erdê çandinê hunda nebe. Ji xey- nî şînayiyên ku li Ewropa pîrr he- ne, bi hêzanî pîvazê ku hemî Kurd jê gelek hez dikin û çend şînayiyên weka zebes, xiyar, gundor, balcanê reş, bamya, isot û xesê ku yezîdî jê nefret dikin tînin çandin.

Lawir

Li Kurdîstanê, lawirên hov hunda ne bûne. Di sedsala 19a de, hîn jî şêr hebûn; eger ew fro ne mabin jî, pi- ling hîn hene. Hirçên ku li Nebir- nao, li Başûrê Wanê, ji wan re "ma- seke tije xwarin, ji hezfranê heta filonê" (Balsan, r.229) heye pîrr in; xînzîrên hov, li Bingolê pîrr in (di 1939 de, di sê mehan de, 1200 hatin kuştin) (Balsan, r.90-1) û 55 di careke tenê de, di 1963 de, li

Barzan hatin şerjêkirin. Gur, torîk, rovî û keftar gelek caran ji gundan nêzik dibin. Lawirên din jî hene ku ji wan re hov dibêjin, lê ku goşt naxun. Ew, yan ji bo goştê wan, weka pezkoviyan û van jî ji bo şabûnê (kêfê), weka kiroşkên hov û kiroşk, tîn nêçîr kirin. Jûjiyên ku tîn xwarin, weka ku filleyên navçeyê ji wan re ewha dibêjin, sihorên sivik û lawirên dinên piçûk ku kurkê wan pîr xweşik e (bi fransîzî: martres, zibelines; bi tirkî: zerdeva, samur) û ku ji bo kurkên wan tîn kuştin hene. Ji bo vê yekê, pêwîst e em şaş nebin ku Kurd ji roja çêbûna xwe nêçîrvan e. Teyr jî pîr in. Çiyayên bilind teyrê bazê biheybet dihewînin. Çem û kanî ordek û (sarcelles: bagirtlak û bécassines: su çullugu) dikişînin. Di 1972 de, 500.000 ordek li ser gola Rizayê zivistanê derbas kirin û zikê xwe bi celebên kurmên biqalik (çrustacés: kabuklular) ku tê de dikelin tîr kirin, û di eynî demî de, gola Wanê gelek binên (pêlicans: kaşikçikuşu) dihewand (J. Vieillard, le Monde, 13.1.73). Bilbil, leylek û quling di tabîetê û di stranên kurdî de jî hene. Tivîlk û kevok, bi hezaran, şkeftên ku nayên jimartin û çiyên, bê rawestan, îşgal dikin. Kew û susk çivîkên nêçîrê yên çêtirîn in. Masî di çemenê ava hênîk û zelal de pîr in. Lê, ne her gav hêsan e ku meriv wan nas bike û ji wan re nav bide. Di Zabê de, masîkî qelew ku fille jê re dibêjin "masiyê Tobî" û ku dirêjbûna wî du metre ye û tama wî pîr xweş e heye. Wêneke wî di Hamilton, r.32-33 de heye. Li ba van lawirên zerîf, pêwîst e meriv bala xwe bide marên piçûk, lê bi jar, dûpişkên zer yan reş ku vedana wan kare meriv, bi hêzanî zarokên pîr piçûk, bikuje. Lê marmarok, gumgumok û kîso bê zerr in. Lê, di beharê de, meriv ji mêşan, kelmêşan û kêçan ku belakî rast in ditirse. Mêşa hunguv jî vedide, lê hunguveke hov û pîr xweş dide.

Li ba van lawirên ku bi serbestî dijîn, li Kurdistanê gelek lawirên ku meriv ji bo menfeeta xwe xwedî dike hene. Ev xwedîkirin ji demên pîr kevn dewam dike (Ch. A. Reed, Animal domestication in the Prehistoric Near East, Braidwood. Prehistoric investigations in Iraqi Kurdistan, Chicago 1961, 119-45). Bi rastî, Kurdistan welatekî xwedîkirinê ye: pez, bizin, çêlek û gamêş, ji xeynî şîr, rûn, penîr û goşt, çerm, kurk, hûr, qiloç didin. Çerm û hiri-

yên wan ji bo çêkirina cil, sol, kulav bi kêr tînin û karekî aboriyekî rast tînin. Di 1957 de, li navçeyên kurdî yên Tirkiyê, 17.662.332 pez û 4.176.016 bizin, ango 1/4 ji tevayîya xwedîkirina lawiran li Tirkiyê; û 2.240.825 çêlek, ango 1/6, hebûn. Gelek gamêş jî hene (Balsan, r.128). Li wilayetên kurdî yên Iraqê, 1.674.912 pez, ango 2/3 ji xwedîkirina lawiran li Iraqê, 2.234.238 bizin (2/3), 226.858 çêlek (1/3) û 4.287 gamêş (1/10) hene. Ji xeynî xwedîkirina mezin a lawiran ji aliye koçeran (li Iranê, ew nivê "produksiyonê: ürûn" ava dike; Stauffer, r.291), her malî kerîkî wê yê piçûk ê çend mî yan bizin (4 heta 8) heye (Stauffer, 290). Gundên kurdî yên Iraqê ku Barth (r. 19) li ser wan lêgerînekê çêkiriye, hîn dewlementir in. Her malî çend mirîşkên wê jî hene. Celebên cihê yên pezên bi dûveke qelew û yên bizinên bi mûyên dirêj hene. Ew malên (hebûnên) çavekirî yên şivanên ku seneta xwe baş zanin in. Di jîna rojî (her roj) de, lawirên dinên pîr pêwîst jî tîn xwedî kirin. Li ba Kurdên Iraqê, meriv 22.289 hesp (1/7), 52.336 bergîl (nêzikî tevayîya yên Iraqê), 130.804 ker (1/3; Xosbak, r.52) dibîne. Em seyên (kûçik) şivanên kurd ku cinsê wan xurt e û ku meriv ji wan ditirse (Balsan, r.236) ji bîr nekin. Bi taybetî, li Kurdistanê ne xinzîr û ne kiroşk tîn xwedî kirin (Arnab, suppl.).

Binerd

Binerdê Kurdistanê, bi dewlemendiya xwe, ji sererdê, bi şînayî û lawirên xwe, ne kêmtir e. Lê, heta nûha, dewlemendiyên wî bi dereceke ne kaffî hatin bi kar anîn. Komir li navçeya Maden, Kigi, Kemah û Xarpûtê, ku ew li wira tê derxistin (di 1970 de, çend hezar ton) pîr e; li Zaxo, li Kurdistanê Iraqê, ew nayê derxistin. Li nêzikî Sileymaniyê, kevirê kilsê tê traştin (şkenandin) û derxistin, û li Sar Çinar fabriqeke çimento, ji sala 1958, 350 ton çimento di rojê de çêdike. Li Sin-car, Şayxan û Tuz-Xurmatu, depoyên xweyê xam tîn bi kar anîn. Li navçeya Senna, li Amadia, kibrît tê ditîn û Polonî dixwazin jê, di salê de 250.000 ton, li Mişrak, li Bakurê Kurdistanê Iraqê, derxînin. Hesin li Kurdistanê ne kêm e û ew tê derxistin (1.600.000 ton di 1960 de, li Maden). Lê, depoyên xamên hesin ên pîr dewlemend, bi hêzanî li navçeya Rawendûz û Sileymaniyê, tîn bi kar

STRANEK GELE RÎ: XERABO

-II-

Min di bazê dila barê xwe bar dike, berê xwe dide aşê mala Hacı Sendî e.

Tu li wê newalê timam bigere, tu li heft seriya bigere, tu çavki di wan de nabîne.

Min di mirata çapê li arvanê bazê dilê min dixîne.

Heft çap û nîva ji arvanê bazê dilê mi hiltîne.

Daweta min û Xerabê bi tenê sala vê salê nêv çî li dar dimîne.

Xerabê mi xeyidî ji gundiya, ji maliya.

Mi di da ser rêka Omeriya,

Minê digo: "Ezê rabim, ban kim heval û hogir û hemşeriya,

Bila herin, xelkê delal vegefnin bi kef û eşq û laqirdiya,

Bila Xwedê teala biqedîne miradê miradxwaza û dilketiya,

Bila miradê min û Xerabê mi bimîne heya koçerê me vegefnin ji deşta Mûşê, rûnin akinciya.

Xerabo, dîno, Xerabê xelkê,

Te bêjin ziravo, bi terha benikê,

Dilkê min û bejna zirav di hev hebû çî kula go ketiye mala xelkê.

Xerabo, dîno, mala bavê keleşgewra mi li wê çivê, li wê ewcê, li wê zikakê, li wê fitlekê,

Te meşqazê, meşqetikê, meşordekê,

Heçiyê xortê go bi çavê xwe di û bi dilê xwe zewicî, ewê sê roj û sê şevê xwe kuştine ji dinyayê, ji qocê felekê.

Xerabo, dîno, bila li te be, li wî dilî,

Bila li mala hezar û heft sed bavê te be, li wê sewdanê, li wî aqilî.

Çewa te dev ji mi, kihêla serê tewla berda, tuê li bergîla şixulê Rismiliya û Qibaliya dihesilî.

Mi ji te re ne go: "Di meha biharê, bergîla li şwîna kihêla metewilî!"

Li xûşka mezin binêr, dî re xûşka biçûk ji xwe re werî.

Lawiko, dîno, ezê çî bikim? Sala vê salê, ez bi mîr im, tu bi jin î.

Kul û kederê te gelek in, şak berdane ser vî dilî.

Kul û kedera ji bîra nakim, heya axê mezelan, kêlê di kevirî.

Kul û kederê te pir bûne, tucar dernakevin ji vî dilî.

Xelkê digo: "Keleşgewra te esmer e û genimgwîn e."

Bi xelkê tehl e û bi nevsî ni şêrîn e.

Tu rabe, serê xwe di kulek û şibakê qesrê re biderzîne!

Bila sira baê Qerejdaxê li ser şêbiskê te ê şê xîne!

Bi ser henarkê rûkê rastê te vegefnê.

Ez dikim herim welatê xerîb û xurbetê, tu kanî ramîsanekê bi mi de, ji boxaza qirikê, ji xanûmanê gerdenê,

Bila kederê ramîsanê te keçikê li welatê xerîb û xurbetê di dilê mi de nemîne.

Wexta Ezrafl dakeve, rûhê mi distîne,

Wê gavê, bila diwanzde mikweta zêdf heqê mi li mi xîne,

Bila heqê ramîsanê keleşgewra mi ji mi hilîne.

Xerabo, Xerabo, Xerabo! Wey li minê, wey li minê,

Çewa fro hatiye cewaba nexêr e ji mi keçike re.

Digo: "Delalê dilê te li welatê xerîb û xurbetê nexweş e, nexweşekî li ber mirinê."

Ezê ji komê pismama ne wêrim herim serêkî bidimê.

Xwezî ji xêra Xwedê re, ezê bîstekekê li tenîştaya Xerabê xwe rûniştama, meyê li hevûdu helal bikira heqê ramîsana, malîfeta derdê dilketinê!

Gelî gundî û malîno, car û cîrano, hûnê bi qedrê Xwedê kin, mala Xerabê
mi ziyareteke pir evzel e, hûnê bi destê min bigirin
û mi bibîne.

Çi darika di bexçê mala bavê mi de bû, ji gula, ji beybûna xemilandî,
Xerabê mi rahişti hejkî, lêxisti, timam diweşandî.
Bê lome be, çewa dostikek mero gelik i bedew hebe,
Li çiyakî mina çiyayê Omeriya be,
Mero dev jê berde, dil pêkeve erebekê, li binê beriya jêrf, û lêvdeqandî!

Xerabo, wile, tu Xerabo,
Malê te pir e, ji canê te re edabo!
Tu bi şexkî diwanzde elmî bo,
Sed werdê te di bêrfika mi de bo
Qenyantiya dilê mi bi te nabo!

(Kovara HAWAR N° 38, 1942, rûpel 12-14.
Straneke gelerî ku ji aliyê "TAWÛSPARÊZ",
li ba eşfra Omeriyan, li Mêrdînê, hatiye
bijartin)

DEPREMA ERZURÛMÊ

Bira

Rojek çêle, qeşa û berf diket
Sar û seqem, bayê cemidî dihat
Bû şev, ro çû ava û reş derket

Gundî wê rojê jî ji kar hat û ji hal ket
Têrkirina zarokan û qedandin bi sîbet
Lê dîsa nebû zadê zewade û namet

Wextê li ber şîvê runişt tev malbet
Di wê kêliyê de xanî hêrivt û erd şikest
Ava sewfla û xwîna însana li hindur lev ket

Ji binê wî xanî yek bi zor derket
Li gund nêrfî û jê ma heyret
Û dît bê çend insan bûne ceset

Bo wan şêx melan dikirin kelamet
Bê avdest û bê tehret divan bikin ibadet
Û şîret didan tev tobe bikin cemaet

Ji mij û duxanê, wek rojek dawet
Û digotin ev millet û cihê cehalet
Li gora dinyayê encex ev bibe rîwayet

Êdî ji ber depreman nema taqet
Pir' ji me mirin û gelek ma ne seqet
Wekî din jî her bi feqîrî û sefalet

Encex weha ne li dinyê felaket
Qernê 20 de weha rezalet
Ger li sebebbaran bibarin nalet

TÊGÎHEŞTÎNA ÇÎROKÊN GEL

- III

Tarî

DI ÇÎROKAN DE DAXWÎYANA AXA Û AXATÎYÊ

Dema ko me gohdarî li çîrokên xwe kir an xwend, emê bibînin ko gelê me di çîrokên xwe de gelek qala axayê xwe, mîrê xwe û begê xwe kirîye. Ti xweruyîk "özellik" nehiştiye di derheqî van kesan de. Pêwanê em wan kesan êdî xweş nas dikin. Bi vê cih danê de nasandina wana ji xwe re kiriyê armanc. Ji alîkî din bi vê yekê rista xwe yî civakî didî nasandin. Ev rist weke xelekekê xwe berdaya ser milê gelê me, hişk girêdaye, qet nahêlî ko bitevgerî. Gelê me vê ristê, xweruyîya kesên ko ev rist di destê wan de xweş nasandin e. Divê ko em jî, dîsa bi devê çîrokan wan kesan nas bikin. Weke hozanê şoreşger î hêja Ehmed Arif gotî: "Ev namus e, li kunya me hatîye kolandin. Ev jî sabir, ji jehran hatîye parêzandin. Evan mar û maşot in. Evan jên ko çav berdana nan û girara me. Wana nasbike, nasbike û mazin bibe".

Daxwîyana axatîyê: Axatî pêmayîneke

Nîşe:

Dibê fermanîk ji siltanê Osmanî di derheqî Ehmed axayê millî derdikevî. Divê ko Ehmed axa herî heft sala serbazîyê "askerî" ji Tirka ra bikî. Ehmed axa li ber çûyîna serbazîyê dizvîrî eşîra milla.

- Heye ko ez bême kuştin an bi emrê xwedê ez bimirim û nezîvirim. Va kurê min Bersêl axa li cihê min. Ew qenc, ew xerab bî, divê win wî deynin ser cihê min û axatîyê li we bikî. "Ji çîroka Ehmed axayê millî".

Weke ko di çîrokê de hatî berxistin, axatî pêmayîneke e. Ew çiqas bikêrhatî jî bî, li kirîna axatîyê ji heft bavê axa çêtir jî bî, gelê me vî cihî nadî kesekî din. Nemasa cihê xwe li wêdê nabînî. Vî karî ji karê xwe cida diarî.

Nîşe:

- Lawo, dibêjî Bersêl axa pîrê. Hege tu ji malaka baş bana, tu kurê Ehmed axayê millî bana, rayîk ji mala paşayê millî bi te ra hebana, te destê xwe li me hilnedîda. Lê ew dêlika diya te, te ji ber kîjan dar û devîya girtî, tu dirabî vana li me dikî. "Ji çîroka Ehmed axayê millî".

Axatî pevgirêdanîya malbata ye

Nîşe

Dibê wê salê qehtîke giran hat ser koçerên zozana jorîn. Heywanê wana qelîyan, insanê wana ji birçîya telîfn. Dema berê ko insan dikete tangayîyê, çavê wana li yekî digêrî de arîkarîyê bidî wana. Ehmed begê, begê koçerê zozana jorîn, xwe li Xalit begê, mîrê deşta Rihayê digrî. Bi hev re heywanê xwe diçêrînin, parîyê nanê xwe li hev leva dikin û derdikevin baharê. Di vê navîyê de Ehmed begê keça xwe Gurca Muşê didî Xalit begê. Li veqerê zozana jorîn wê dawata bihate kirin.

Li veqerê êla Ehmed begê liqayî deşteke bixêr û bêr dibî. Konê xwe di berdî erdê. Nêta wan li vê deştê mayî e. Deşt ya Usif begê, maqulê Homanê ye. Usif begê nahêlî de êl li koza wî deynî. Bi merca dayîna Gurcê enceq wê êl li deştê bimana. Ehmed begê divê ko keça xwe yî bîdergîstî bidî Usif begê. Pêşî Gurcê, piştra kurê Ehmed begê î biçuk li ber biryara bavê xwe dirabî.

- Berxa minê, dibêji Gurcê diya wê. Çavê te birijihf, situwê te bişikf. Bavê te Ehmed begê, milukê zozana jorîn, ma zaroke tu van gotin û galgalê bêedebf li ber dibêji. Ma tu ji bavê xwe binamustirf. Da rabe situwê xwe bişikêne, cilê xwe yf bûkanf li xwe bike, xwe bixemilfne. Xwe berde, rahêje misîne qehwê, here li ber Usif begê, li cihê edebê bira-weste.

Gurcê ser vê gotina diya xwe, situwê xwe xwehr dikf û bi ya dê û bavê xwe dikf. Lê kurê biçûk Heso le ber xwe didf.


- Yabo, dibêji Heso. Tu xuha min rojekê didf yekf, ji yekf disitênf. Ez kurê te Heso me, birayê biçûk im. Bi navê xwedê ko hate derheqa namûsê, ez tiliha xwe dixim ber çavê xwe, nura xwedê ji çavê xwe dertînim. Ez ti bazarî li ser Gurcê qebul nakim. Min xuha xwe daye Xalit begê, mîrê deşta Rihayê. Kesik ji xeynî Xalit begê ez nahêlim ruwê Gurca Muşê bibînf.

Ehmed begê guh nedaye kurê xwe Heso jf. Keça xwe daye Usif begê. Xaber digihêji Xalit begê. Xalit begê tevlu sad suwarê xwe tê li ber biryara Ehmed begê dirabî. Ev yek li Heso xweş nayê. Tiştê ko Xalit begê li buwara bavê wî kirî bêedebf qabul dikf. Ew jf ji biryara xwe yf dayf de-vegerf, li gel bavê xwe cihê xwe digrf.

- Yabo, dibêji Heso. Ne ko Gurca Muşê bêxwedî ye. Ez birayê wê Heso me. Gavanê suwara me. Me soz û qerar, bext û dîn daye Usif begê. Yabo ez nuha xwe jê nasitênim û nadim Xalit begê. Ko Xalit begê û sad bavê wî li ser bin, win mêr bin û mêrê çê bin, winê bên Gurca Muşê ji binê kon derxin.

Dibê ser vê gotinê Xalit begê dirabî Gurcê diravênf. Heso didf pay Xalit begê û sad suwarê wî. Wana di nivê deştê de digerf. Dikevin şerekî giran. Heso her tim li derba kuştina Xalit begê digerf. Lê destê Xalit begê nagerî de derba kuştinê li Heso bixf. Pêwanê şerê wana dom dikf. Di vê naviyê de dilê Gurcê bi birayê wê diêşf. Ji kuştina birayê xwe ditirsî. Dibakî xulamekî, dişiyênî gel Usif begê, de hawarekê bişiyênî. Usif begê wê rojê di mêhvantiya xalê xwe de ye. Dema ko dibihîzî hawarakê ji xalê xwe disitênf. Diçî bajarê Homanê. Ji wir jf hawareke giran radikî û xwe digihênf hawara Heso. Gurcê dibînf ko hawareke giran li ser Xalit begê de girt. Hingî Gurcê divegerf birayê xwe Heso.

- Heso, dibakî Gurcê. Birawo lo. Min nizanibû wê felek li serê min bigerf. Min digot tu û pismamê xwe Xalit begê heneka dîkin. Min nizanibû wê ev bên serê Xalit begê. Hege tu hawarê nedî Xalit begê haveyna namûsê di serê te de nîne. Te çî li serê me kir malmîrato. Tu dibînf du eşîrê giran xwe kişandine ser Xalit begê. Ma namus di serê te de nema. Pismamê te Xalit begê bitenê ma Heso.



Axa û gundfyek ji Kurdên Kalbor

Türken, Kurden und Iraner seit dem Altertum
Egon FREIHERR VON EICKSTEDT, Professor der Anthropologie
Stuttgart, 1961

Ser vë galgal û gotinê Gurcê, Heso lingê xwe li hemdanîyê dişidênf û xwe digihênf pismamê xwe Xalit begê. "Ji çfroka Ehmed begê û Xalit begê".

Nîşe

Dibê Îskanê Gulîxan çav berda ravandîya Elfyê Mehmed Seyrê Xatun. Dê Seyrê ji xwe re bisitênf, wê şevê Elfî dikujf. Seyrê ji wir diravf, diçf serê çiyayê Mehdfiya. Ji wir xeberê ji birayê xwe Qol Qasim ra dişiyênf.

- Qol Qasimo keko, dibêjî Seyrê xatun. Ez neketim ber hetiket û rureşîya dinyayê. Ez ketim ber Elf. Elfyê ko kurapê min û te bu keko. Laşê wî li kelha gomanîyê, di nav lapên dijmin û neyaran de, Qol Qasimo keko li wêdê bêxwedî maye.

Dibê Qol Qasim xwe digihênf kelha Gomanîyê. Bi awakî dibakî Îskanê Gulîxan, wîna tênf bin konê xwe. Wîna didf axaftin. Piştra lê dizivirf.

- Heyla min bavê te di qebra reş û tarf de rayandf, dibêjî Qol Qasim. Ji eqlê te weye ko Qol Qasim ji kuştina kurapê xwe bihurtfye. Sabav kurê wî sabavî? Çawa destê te çû yekf weke Elfyê Mehmed, wî tevna lê xorta. Di xewna şîrîn de kuşt. "Ji çfroka Seyrê".

Axatî hevkarîya tev axa ye

Nîşe

Dibê Qol Qasim kuştina kurapê xwe Elfyê Mehmed ji Îskanê Gulîxan pirsî.

- Êvar bû, dibêjî Îskanê Gulîxan. Xortek û qfzek dane devê derf. Min ji wana pirsî. Xort ji min ra got ko eva min ravandf, xuha Qol Qasim e. Min got, malava. Welatê Hesenan û Heyderan û Qol Qasim kirfvê me ye. Em yên hev in. Mêrikê axa hevdu nasnekin jf, her tim yên hev in. Milkê me yên hev in. Min meyzand ko xuha te ravandfye. Min bi sîyasetî mehra wana da kirin. Min wana xiste odekê. Dema ko razihan, min xencera xwe kişand û min wî kuşt. Min divabû ko xuha te li gel xwe bigrim û xeberê bidime te. Lê xuha te xwe li derf xist. Hêj jî nizanîm bê li ku ye. "Ji çfroka Seyrê".

Nîşe

- Derwêşo, dibêjî diya wî Hiznoşê. Imirqesifyo. Ma min negotibû ti carî zirt û porta li xalê xwe Teyarê Qetran meke. Hawara hazar û haftsad malê Êzîdxana. Rabin nama bişiyênin ser eşîrê giran. Namê bişiyênin heta Wêranşehira xopan, ser Îbrahîm paşa, namekê ser Diyarbekrê, ser mala Cemîl paşa, namekê ser Yemenê, ser Fêris begê, namekê heta pişta Bexdayê, ser Hadfîyê Dexîl axa, namekê ser Cizêrê, ser mala Bedir Xana. Belkî bicivin li quntara çiyayê Êzîdxan, barstika kurê min Derwêş axa ji destê birayê min Teyarê Qetran derxfnin. "Ji çfroka Xezala Kurda".

Nîşe

Dibê Mihemed begê mîrik jî yê Bohta bû. Muso jî yek ji xulamê wî bû. Mihemed begê çavreşayîk avêtibû Muso, kuştina wî dabû ber çavê xwe. Lê destê wî nayê milê Muso de wî bikujf.

Dibê Mihemed begê rabû bakire Zeynal begê, mîrê Muşê, Hecî Ebas, mîrê Kelhapozreşê, şaqulê Berwarî û tev axa civandin. Tedbîra xwe di oda xwe de danîn, de Muso odê de bikujin. "Ji çfroka Muso".

Nîşe

Dibê Kîkî paşa heft birayê Menca Elfîyîyê Sêlim axa avêtiye zindana xwîniya. Mencê bi cêrîke xwe re diçf gel mazinê eşîrê Kurda, de birayê wêna jî zindanê derxin. Dibê Mencê dêsî diçf gel Hiseyn axa, bavê Siltanê, begê koçerê zozana. Piştra diçf gel Bişarê Kolo, qewalê Êzîdfiya û mazinê heft hazar Êzîdfiya ji wir diçf gel Ferho axa, fexê Izêr axa.

- Keko Ferho axa, dibêjî Mencê. Min xwe li nav û dengê Ferho axa, ferxê Izêr, beranê zozana, keliha mehkum û xwîniya girtiye. Ez ne ketime ber girtinê. Girtin girtina mêre, qeyd xilxalê şêra ye. Îroj duwazdeh rojin, heft birayê min, ne mêr kuştin, ne mil firandin û ne kerwanê dewletê şelihandin. Ketine zindana bedena bajarê Diyarbekrê. Ez ketim bextê xwedê û te, tê birayên min ji destê Kîkî paşa, ji xwedênenasî derxî. "Ji çîroka Menca Eliyê Sêlim axa".

Bi van nîşa diyare ko axa her tim di hevkarî, piştdayinê de ne. Bi vê hevkarî û piştdayinê rista xwe yî eşirtiyê heta îroj didomênin. De hêj qewîn bibî jî hevkarî û piştdayina dewletê serdest jî di ser ve dixin.

Nîşe

- Ew keça ko te dîtî xuha me ye, got birayê Mencê î mazin. Ma emê bidine yekî ji te çêtir. Tu îroj li keliha bedena Diyarbekrê Walî yî. Em mêra bikujin, mila bifirênin, tu karî afwa me bênî. Bi xwedê em nadin yekî ji te çêtir. Emê bidine te. "Ji çîroka Menca Eliyê Sêlim axa".

Daxwîyana axa

Di çîrokên me de tevgerin hene ko gotinên wana jî dilê yekî dixelênin. Lê axa bi hêsayî wana gotine. Dîsa di çîrokan de xedarîn hatine kirin. Ew xedarî ençeç li bejn û bala axa tê. Xweruyinin hene em wana di tev axa de dibînin. Gelê me vana gelek xweş û zelal diyar kirin e. De em wana xweş binasin.

Nîşe

Menca Eliyê Sêlim axa xwe li mazinê eşfra girt. De heft birayê wê ji zindanê derxin. Dema ko Hiseyn axa çav li xweşkayf û delalîya Mencê kir, tev rayê bebabîyê ji enîya wî rabûn.

- Xatunê, got Hiseyn axa. Ezê nûha rabim herim, li ser bajarê Diyarbekrê bigrim, bajar di serê Kîkî paşa de bênim û heft birayê te ji zindanê berdim. Lê divê tu mehra xwe bi temamî bidî min. "Ji çîroka Menca Eliyê Sêlim axa".

Ser vê gotinê Mencê rabû ji kon derket. Çû gel Bişarê Kolo, qewalê Êzîdîya û mazinê heft hazar Êzîdîya.

- Xatuna min, got Bişarê Kolo. Heft hazar konê Êzîdîya li vir hene. Ezê eşheda her heft hazar kona li ser destê te bênim. Ezê rabim herim serê Kîkî paşa bênim, li ber te deynim. Lê divê tu mehra xwe bidî min. "Ji çîroka Menca Eliyê Sêlim axa".

Nîşe

Dibê Eliyê Mehmed keçapa xwe Seyrê xatun ravand, bir kelha Gomanîyê, gel Îskanê Gulîxan. Dema ko Îskanê Gulîxan çav li Seyrê kir, hema çû destê xwe disitwê wê de anî, kaba xwe ser kaba Seyrê danî û dewisand.

- Sê wadê xwedê li vî canî ketibî, got Îskanê Gulîxan di dilê xwe de. Ezê tiştina bênim serê Elf, vî mêhvanî. Ev goştê berxika, ev goştê nazik jî ku anî li ber koka diranê min danî. Ezê îşev Eliyê Mehmed bikujim. Ezê Seyrê xatun deynim ber vî canî. "Ji çîroka Seyrê".

Nîşe

Dibê dema ko çavê Tahir begê li narenciyê ket, eqil û sewda di serê wî de nama.

- Bi xwedê, dibêjî Tahir begê di dilê xwe de. Ew kaça wî bî, ew buka wî bî, ew jinbira wî bî, ew jina wî bî, ezê jê bisitênim. "Ji çîroka Narenciyê".

Xedariya axa

Di çîrokên me de xedarîn ji aliyê gelê me hatine diyarkirin ko kirina

wana nayê bîra yekî de bikî. Lê axa, mîr û beg van xedarîya kirin e. Ev xedarî de em ruwê axa xweş binasin di çîrokên me de cih girtin e.

Nîşe

Dibê Qol Qasim cezma Îskanê Gulîxan ji piyê wî deranî. Destê wî bi duvê haspê ve girêda. Doma sê seata gêra histirîya pê kir. Piştra anî li ber xwe danî. Bi xencerekî çavekî wî deranî. Têra çaroxekê ji pişta situwê wî jêkir. Çengê wî bi saxî şikênand. Ji dilê xwe re wî da bérşûr û xencera. Laşê wî avêt ji kuçik û tajîya ra. Serê wî jêkir danî xurcezîna xwe. Bi vî awayî heyfa kurapê xwe Elîyê Mehmed hilanî. "Ji çîroka Seyrê".

Nîşe

Dibê Eloyê Sêxanî rabû li revê derîyê odê çalîkîk da kolandin. Hiseynê Gizîr û Mihoyê Qeysanî di wê çalîkê de çikand. Çar pênc kuçik xistine mezelekê. Derî li wana girtin û heft roja nan nedana wana, av şanî wana nedan. Piştî heft roja çiqas pazê jar hebû, gurandin. Ur û pizurê wana avêtin ser serê Hiseynê Gizîr û Mihoyê Qeysanî. Derî li ber kuçîka vekirin. Kuçik dema ko çav li wan ur û pizura kirin, êrîşî wana kirin. Dest bi xwarinê kirin. Di vê navîyê de lêv, guh û bêvilê wana jî xwarin. Serê wana weke du kumîka li wir hiştin. Wana di çalîkê de temam kirin. "Ji çîroka Eloyê Sêxanî".

Tirsonekîya axa

Tirsonekî her tim xweruyîyek axa ye. Gelê me ve tirsonekîya axa di çîrokên xwe de xweş diyar kirin e.

Nîşe

- Zarono, got Qol Qasim. Heçî kesê weke Îskanê Gulîxan ne, ziravê wana ziravê rêvîya ne. Ko win bêjin wê bi me ra şer bikî, em wî bikujin, an ew hina jî me bikujî, ew nîne. Ko têderxî, wê bikevî qulekê, ko hazar salî em lê bigerin, em wîna nabînin. Vêca, divê em bi meqamekî wî bixîne destê xwe. Nexwe nakevî destê me". "Ji çîroka Seyrê".

Nîşe

Dibê Evdîla begê, birayê Şêxê Şamara, Ehmed axayê millî di xew de birîndar kirîye, û ravandîya wî Meryem xatûnê ji xwera birîye. Ehmed axa xwe girandê la Evdîla begê. Li terş û talanê wî xist. Evdîla begê xwe gihand hawara terş û talanê xwe. Evdîla begê berî şer di zivirî xulamekî xwe.

- Here bêje wî kesî, got. Hege welatekî ji min dixwazî, ezê bidimê. Bere berê xwe ji ser talanê min bidî alîkî. "Ji çîroka Ehmed axayê millî".

Nîşe

Dibê bezîrganê dewletê ji bonî sitandîna bêşaê la Emer begê nezîkayî dayeê lî. Siyamend bûye hezaê la, hatîye li tanga rêya bezîrgan, serê rîma xwe berdaye erdê û berbenî bezîrgan rawestîye. Dibê bezîrgan ji dûr ve çav li Siyamend kir. Zivirî xulamekî xwe.

- Here meyzê lawo, got bezîrgan. Wî siwarîk li rêya me rawestîye. Here gel wî kesî. Hege mîrin kujtîbin, jinî ravandîbin bi adetê, hatîbî dawa tiştêkî li me dikî, xelatekê bidîyê. Bere xwe ji rêya me bidî alîkî. "Ji çîroka Siyamend û Xecê".

Em karî van nîşa hêj zêdetîr bikin. Gelê me di vê sedemê de jî gelek nîşe diyar kirin e. Bi sadan çîrok ser wana jî me ra hiştin e. Dengbêj, çîrokbêj û tanburvanê me li gotîne girîk bi xwe ve nehiştin e. Lê belê em dibînin ew kez hêj hene û em bi evîna wana, bi tirba bavê wana sund dixwin.

İNLEYEREK AKIYOR DICLE İLE FIRAT

Bira

Ulusların en ileri, çağdaş düzeye vardıkları günümüzde Kürt halkı zorlu bir yaşam savaşı vermektedir. Acı içinde kıvranan bu halk, ölüm kalım mücadelesi içindedir. Türkiye ve Kuzey Kürdistan'da (T), sefaletin olduğu, enflasyon hızının gün geçtikçe arttığı göz önünde. Halkın ürettiği geçim kaynaklarını, cunta ucuz bir şekilde elinden kaptıracağı gibi, alım gücünden de etmektedir. Kürt halkı, Türk burjuvazisinin fabrika üretimi ayakkabı, şeker, elbise vb. önemli mallarını da alamamaktadır. Hele hele et ve meyve gibi pahalı besin maddelerini zor alabilir. Geçim zorluğu, köylerden çok şehirlerde görülmektedir. Çünkü emeğini satarak geçimini sağlamaya çalışan işçilerin gelirleri, olsa olsa ev kirası ve bit pazarı'ndan bir kaç parça giyim eşyasına yeter. Köy durumu ise bundan farklı. Kira vermediği gibi, senelik geçim kaynağının çoğunu da kendi üretiyor.

Kürdistan'dan bazı bölgelerde köylüler, "Şal û Şapık" denilen giyim elbiselerini de kendileri üretiyor. (Bunu bile Kürt halkına çok bulan Türk devleti, bu elbiselerin yapım ve giyimini yasal olarak yasakladı. Sömürgeci devletin bu kararına uymayan köylülerde cezalandırılıyor.) Kürt halkının senelik geçim kaynağını, kışlık etini bile hazırladığı ve sakladığı bilinmektedir. Ama, son zamanlarda generaller cuntası işi iyice azıtmışki, askerini Kürdistanın her tarafına, hayatın her alanına saldırtmaya başladı. Öyleki, Türk devleti, Kürdistan'daki insanların ağızlarındaki lokmayıda çok bularak, kurduran it gibi önüne gelen her şeye saldırıyor artık. İçinde bulunduğumuz ayın ilk haftasında, Şehire inen altmış kadar köylü, katır ve atlarına bugday yüklemiş köylerine dönmekteydiler köyleride yüksek dağ yamaçlarında olduğundan seneden seneye şehire bir veya iki sefer inen bu insanlara rastlayan Türk askeri, işkence yapıyor ve tutukluyor, bunun yanında bugday yüklerini talan ediyorlar. Tarihte eşine az rastlanır tipten olay ve işin ilginç yanı şu ki mal talanı, insanlara işkence ve tutuklama yetmediği gibi hayvanlarıda hapis alıyorlar. Yani kısaca söylenirse, Türk devleti, Kürt insanını ve aynı zamanda hayvanını tutuklama insafsızlığındadır. Barbarlığın başka ayrı tarafı varmı acaba?

Şayet generaller cuntasının Hürriyet, Tercüman ve benzeri gazetelerinde böylesi bir haber yayınlanırsa, hiç şaşmamak

gerekir. "savcı ve hakimler dağlarda yuvalanmış devlet düşmanı teröristlere erzak taşıyan 60 bölücü-komünist at ve katırı idama mahkûm etti." Kürdistan, tüm olarak Türk ordusunun görülmemiş baskısı altındadır. Son zamanlarda yığınla insan göz altına alınıyor, işkence görüyor. Sınır bölgelerinde topla ma kampları kurulmuş ve bu kamplarda vahşi bir baskı uygulanıyor. İnsanlarımız zoraki göçe zorlanıyor. Yüz bin insandan fazla bir kitle, yani 53 köy devlet zorlu ile batıya göç etmeye mecbur bırakıldı. Bu 53 köyün insanları kürt oldukları için göçe zorlandı. Başka suçları yoktur. Onların yerine de, yani sınır bölgelerinde Türkiye'nin batısından, Türkiye'ye göç eden "Türk asıllı" göçmenleri, devlete "sadık" insanları veya Afganlı göçmen yerleştirecek, ya da mayın döşeyecek.

Bu arada, Kürdistan'da zulmun baş kalesi durumuna gelen zindan ve hapishanelerdeki tutukluların durumu ne? Türk ordusu, Jirki aşiretinden yığınla insanı meydan işkencesine çekerse, suçsuz çocukların oynadığı o köylere hava saldırısı, evet paraşüt ile ani bir saldırı yaparsa, kürt olmasından başka hiç bir suçu olmayan o zavallılara akla gelmedik işkence yaparsa, Diyarbakır zindanlarındaki Kürt yurtseverlerine, şanlı bir şekilde direnen o militanlara nasıl davranır?



KURDISTAN, ÇEND ABORÎ Û

SEDEMÊN PELIXANDÎNA GELÊ KURD

1. Sedema aborî

Tevayiya erd û binerdê Kurdistanê pîrr dewlemen e. Ev dewlemendî pîrr cihê ye: petrol, bi hêzanî li Kurdistana Iraqê (Kerkûk û Mûsil), krom, hesin, sifir, komir

Li ser de jî, çiyayên ku piraniya wan bidar in, tevî ziraet û xwedîkirina lawiran, serweteke tabî jî bo welêt ava dikin.

Li gel vê qasê, welat pîrr xizan (feqîr) e. Her çar hikûmetên Tirkiyê, Iranê, Iraqê û Sûriyê, ji gelek salan de biryar stendine ku vê navçeyê di rewşeke pîrr paşketî de bihêlin. Piraniya van dewlemendiyan ber bi navçeyên cîran ên ne kurd tîn ajotin. Tu infrastruktûr ne hatiye ava kirin. Sinaet hema tu neye. Nîşe: karê petrola Kurdistana Iraqê ne jî Kurdan re ye. Xamê hesin ê Divrigî, li Kurdistana Tirkiyê, ber bi senayîên hesinîyên tirk (Eregli, Karabük), li ser Deryayê Reş, tîn ajotin.

Kurdistan mêtîngeheke rast e ku maddeyên wê yên xam û karkerên wê jî aliyê van her çar hikûmetan tîn bi kar kirin.

Bêbextiya Kurdan ew e ku ew jî aliyê welatên ku bi xwe jî ketine bin destên hêzên sermayedar hatine talan kirin. Ev tişt rewşa Kurdan jî ketina wan, rast bi rast, bin destên hêzên mezinên aborî zortir û tevlihev-tir dike.

2. Sedema stratêjîk

Kurdistan di Rojhilata Nêzîk de cihekî stratêjîyêkî pîrr giring stendiye. Ew çaryaneke di nav bera Rojhilat û Rojavayê.

Ji bo vê yekê, serfiraziya serhildaneke kurdî jî bo hêzên mezin pîrr bi tehlike ye, ji bo ku ewê hemî navçeyê tevlihev bike û menfaetên

aborî û leşkerî yên van hêzan biguherîne.

Ji alîkî din jî, ev hêz naxwazin ku pîrsa kurdî bi carekê yemire, ji bo ku, gaya ku pêwîst bibe, ewê wê dijî dijminên xwe bi kar bînin.

3. Sedema idêolojîk

Weka di piraniya welatan de, bi hêzanî di Cihana Siyemîn de, serdestên gelê kurd di bin tesîra bermayiyên idêolojiya sedsala 19a de mane. Imperatorîbû dewleteke navendî. Di vê dewleta navendî de, bitenê çand û idêolojiya merivên ku di hikmê de ne tîn nas kirin. Etniyên din pêwîst e şexsiyet û çanda xwe nizanibin û xwe tîxin bin şovenîzma van nijadparêzan.

4. Sedema taktîkî

Ev zordestî gengaziyeke (wasite) taktîkî ye ji bo ku bala tevayiya xelkê ji pîrsên wî yên aborî û civakî dûr bixin. Bi germkirina merivên nezan dijî Kurdan, bi xurtkirina kîrê û bi danîna veqetandina etnîkî û olî, ev hikûmet digihêjin amancên xwe, ango, ew di hikmê de dimînin û ji xelkê re pîrsên giranên civakî - ji bo demeke kurt - tînin ji bîr kirin.

REWŞA ABORÎ Û CIVAKÎ

LÎ KURDISTANÊ

KURDISTANA TIRKIYÊ

Bi aqareke 230.000 km², Kurdistana Tirkiyê 30% ji axa tevayiya welêt ava dike.

Xwedîkirina lawiran:

Awayê wê kevnar e û ew jî tevayiya fealiyetan şaxeke giring e. Kurdistana Tirkiyê ji Tirkiyê re çêlek, bizin, mî û maddeyên lawirî bi dereca bilintirîn temîn dike.

NOT LI SER JÎNA

ÇANDÎ -III

Pervîn

Çandin:

Pembû, pincar, tutun Ev madde ji bo bazarê tirkî û sînaetê tên çandin.

Serwetên binê erdê:

Fosfat, komir, sifir, hesin, krom, petrol. Bîrên kromê li Maden (li nivê riya Diyarbekir û Elazigê) tên kolandin. Ew ji mezintirîfînên bîrên cihanê ne. Bikaranîna wan (832.000 ton di 1967 de) firset da Tirkiyê ku di cihanê de bibe "produktor"ê duyemîn (piştî Sovyêtistanê) ê kromê. Li gora O.C.D.E. Tirkiye, di 1973 de, gihaşt 2 milyon ton û wan bi hêzanî ji Emerîka re firot. Xamê hesin li Divriqi tê derxistin. Bikaranîna wî digihêje 1,5 milyon ton. Piştî derxistina wî li Kurdistanê, ev xam ber bi senayîên tirkî, li ser Deryayê Reş, tê ajotin. Sifir li Erganî, nêzîkî Diyarbekirê, tê derxistin: 1 milyon ton di 1970 de. Petrol: şirketên multînasyonal (Shell, Mobil, B.P.) ku li Kurdistana Tirkiyê dixebitin her dem digotin ku li wira petrol tu neye. Lê, di salên 60an de şirketê netewîya tirk, T.P.A.O., li Raman, Garzan (Siirt) û Diyarbekirê, petrol dît. Di 1971 de, "produksyon" gihaşt 4 milyon ton.

Riyên stratêjîk:

Ew ji alîkî Tirkiyê, Îranê û Iraqê girêdidin hevdu û ji alîkî din jî qîşleyên leşkerî ku li Kurdistanê bi cih bûne digihênin hevdu. Girintirîfînên qîşleyên bajarên Kurdistanê (Erzurum, Diyarbekir, Malatya, Elazig û Van) girêdayî şebeka riyên trênan a tirkî ne (riyên Istanbul-Ankara-Malatya-Diyarbekir-Kurtulan; Van û Ankara-Sivas-Erzurum). Ew xwediyên meydanên balefirên leşkerî û sîvîl in jî.

Sînaet:

Ew, bi piranî, cihên besît ên hunera destî ne: fabriqên sabûn, zeyt, xalîçe, ên paqijkirina şeker (li Elazig û Malatya), çend fabriqên çimênto (Qars, Erzurum), ên tutun (Bitlis, Malatya), ên qumaş li Diyarbekirê.

Di 1964 de, ji 43.263 şirket, fabriqên piçûk ên destî û atelyeyên Tirkiyê, bitehê 2.427, ango 5,6% (1) li Kurdistanê bûn.

Nisbeta sermaya xusûsî (ne a dewletê) pîrr nizm e. Di 1968 de, bi tenê 1,93% ji şirketên bînav (anonymes) li Kurdistanê dixebitin (2).

Di dawiyê de, em karin bêjin ku pêwendiyên aborî û bazarî nav bera Tirkiyê û Kurdistanê pêwendiyên mêtropol-mêtingeh in, ji bo ku Kurdistan ji Tirkiyê re xezîneke maddên xam û di eynî zemanî de jî bazareke sereke ji bo çêkirina maddên sînaî ên van maddên xam ava dike.

Sîstema banqî pîrr hindik pêş ve ketiye. Di 1965 de, ji 1.981 de, şaxên banqên ku li ser erdê Tirkiyê vebûyî bûn, bi tenê 179, ango 0,9%, li Kurdistanê bûn (3).

Ziraet

Li gel hebûna serwetên tabîî, civaka kurdî paşdemayîtirîna civakên Tirkiyê ye. Ew, di dereca yekemîn de ziraatî ye: 72,2% ji gelhê bi ziraetê mijûr dibe. Sînaet bitenê 5,5% ji gelha "aktîf" distîne. Di bajaran de, Kurd bi ticaretê û bi hunera destî mijûr dibin û di dayirên cihê de kar dikin (4).

Teknîka ziraf pîrr kevnar e, li gel mêkanfzmebûneke piçûk ji 1965 de: 39% ji gîrsinên ku li Tirkiyê bi kar

(1) Statîstîka 1964 (bi tirkî), D.I.E. - Ankara

(2) D.D.K.O., weşanên Dava Dosyasi, Komal, Ankara 1975, rûpel 173

(3) (eynî)

(4) jimartina giştî ya gelha 1970 (bi tirkî)

tên û bi tenê 3% ji aletên ziraf li Kurdistanê ne.
Paykirina erd qet ne weka hev e:

ÇÎNÊN GUNDÎ	% JI GELHA GUNDÎ	% JI ERDÊN KU EW KONTROL DIKIN
Gundiyên bê erd	38	-
Xwedyên erdên piçûk (1-50 donim)	45,4	27
Gundiyên dewlemend (51-200 donim)	14,2	40
Axa, şêx, (ji 200 donim bêtir)	2,4	33

Ango, $\frac{6}{10}$ ên xwedyên erd $\frac{3}{4}$ erd stendine, lê 38%ên gundiyan tu erdê wan tu neye.

Çîna piçûk a karkeran, 5,5%, xwedyê bext (nesîb) e, ji bo ku ew ji çend zagonên (qanûn) temîna civakî kar dikin. Di salên dawîn de, ev rewş jê re hişyarbûneke piçûkeke çîna da.

Di gundên çiyayî û di nav eşîrên niv-koçer de, gelhe ji quhartina maddên

lawirî li hemberî maddên çêkirî: şeker, çay, mucewher, lîstik û carina jî li hemberî meywe (fêkî) û şînyayî (sebze), dijî.

Dayirên resmî, 1%ê gelha aktif a Kurdistanê, û bi piranî di karên ne baş (nizm) de, bi kar tînin.

Dûmahî heye



XEWNA NE BÎ XÊR

Firat Cewerî

Bi dengê teqîna tivingan re hişyar bû. Herdu çavên xwe firkanî, ji nav nivînan rabû û bazda hewşê. Gava ku çav li leşkeran ket, dîsan bi paş de baz da hundir.

Jina wî û herdu zarokên wî hîn di xew de bûn. Mêrik çû ber paçê, hêdf perde da alf û ji der ve nihêrf. Dît ku komek mirov li qadê (meydan, hol) hatine civandin, destên wan li ser serên wan û di nav leşkeran de ne. Mêrik dîsa hêdf perde weke berê kir û li hundir vegehiya.

Jina wî weke ku mirov zixtikan lê bixe ji nav nivînan pekiya, xwêdana ser çavên xwe paqij kir, bi tirs û bi heyecan ji mêrê xwe re got:
- Min çi xewnek ne bi xêr didît!
Lê xewna xwe ji mêrê xwe re negot.

Mêrik li ber serê wê, li ser tûtikan rûnişt û jê pirsî:
- Xêr e inşaleh, te çi xewn dît?

Jinikê axînek kûr kişand û got:
- Tu bi a min bikî ez nabêjim.

Mêrik fcar hebekî wa bi hêrs got:
- De bêje ha! Xêr e, ma te çi xewn dîtiye, ku te evqas xwêdan da ye? Tu hertim xewnên wisa tewlo-mewlo û bi ecêb dibînf. Xwedê zane tu dîsan di ser çiyên miyan re difiriya!

Jinik ji xwêdanê weke ku mirov satilek av bi ser de birjîne, şil bûbû. Piştî ku bi dawa xwe xwêdana ser çavê xwe paqij kir got:
- Na malxerabo, min dît ku leşkeran tu dikuşt.

Hingî bi yek derbê re çokên mêrik sist bûn, canê wî sar bû û xwêdanek cemidî ew girt. Tevzî li ser tevziyê li dila ket û tirsî mirinê lê peyda bû. Pênc salan xwînf û li çiyên mabû, tu caran tirsên wisa li wî peyda nebûbûn. Dû re bi dengê nîvqurmiçî ji jina xwe re got:
- Ma tu zanî, ku leşkeran girtine ser taxê! Ew li ku bin wextî bigirin ser mala me jî.

Ji tirsan û heyecanan zimanê jinikê negeriya, di cihê xwe de sar ma.

Mêrik dîsan got:
- Keçê, Welleh xewnên te carna rast in! Te wê dema han xewn dît, ku cîranê me Xelo miriyê, sibehê em rabûn, ku ew bi rastî jî miriye. Ev

xewna te jî ne rast be? Welleh ez jî çer vê sibehê çav li wan ketim, tirsî mirinê kete dilê min. Ez bi rastî jî nême kuştin?

Jinikê bi dengê hebekî bilind got:
- Hela hiş be, bila devê te ji xêrê vegere gidî! Ma çi ye tu vê sibehê qala mirina xwe dikî? Ev çi sibehê ne bi xêr!

Mêrik bersiv neda. Keserek kûr berda û cigarek vexist. Piştî ku hebekî fikirî, ji jinikê re got:
- Rabe zû ji min re qatek kincên xwe derxe, leşker li ku bin wextî bigirin ser me. Welleh ku fcar ez bê me girtin berdana min tune.

Jinik hema zû ji cihê xwe pekiya û ber bi sindoqa xwe ya kincan çû. Kirasekî dirêj, derpiyek û hubiryek jê derxist û anf danî ber mêrê xwe.

Mêrik qedere deqîqekê li wan kincan nihêrf. Piştî ku cigara xwe di xwêlîdankê de vemirand, dîsa rabû ser xwe, çû hebekî perda pacê da alf û ji der ve nihêrf.

Ew girtînan hîna jî destên wan li ser serên wan û di rêzê de bûn. Leşker tivingên wan di destên wan de bûn û li dora wan bûbûne xelek.

Mêrik perde bi hêrs berda û dageriya hundir. Zû zû ew kincên ku jina wî jê re derxistibû li xwe kir û çû ber neynikê (mirêk) li xwe nihêrf. Piştî dît ku kinc lê tîn, jina xwe hemêz kir, zaroka xwe ya di xew de beyf ku hişyar bike maçî kir, rahişt du satilên avê û derket.

Erê kincên jinan li xwe kiribû, lê ji meşa wî dîsan mirov zanibû, ku peya ye. Taxa wan tije leşker bûbûn. Nemaze dora mala wan jî leşkeran mirov nikanibû gava xwe biavêta. Mêrik bi wî awayî di nav leşkeran de derbas bû. Gava ku bi çend gavan ji wan bi dûr ket, hubirya wî ji serî de ket. Ku daqûl (xwe tewand) bû rahêje hubirya xwe, leşkerekî gule ajot ber devê tivinga xwe û got:
- Di cihê xwe de raweste, tev nelive!

Mêrik li peyvên leşker guhdarî nekir, rahişt hubirya xwe û bazda. Du leşkerên din jî gule ajotin ber devê tivingên xwe, ji wî nîşan girtin û

DÎROKA KURD Û KURDISTAN

- VI

Derwêş

Rêwşa Kurdan di dewra Safewîyan de

Ilhanfyan û Karakoyunluyan hem bi hevra şerr dîkir û hem jî dîxwest axa Kurdistan têxin bîn hakimiyeta xwe. Dema ku Karakoyunluyan zora Ilhanfyan birin, êrîşên xwe bir ser navçên Mukrî. Di vê dewrê de pir' keş dey, ji cihê xwe berdan û ji navçê bazdan. Zilm pir' xesar dîda wan.

Hê ev birfînên nuh sax ne bû bûn êrîşên Moxolfyan dest pê kir. Têmurleng gel pir' diêşand. Paş ku wî êrîşên xwe li ser gelên dora Kurdan qedandin, dest bi talana Kurdistanê kir. Navçên Mûsil, Diyarbêkr, cizîr ûhwê. îşgal kirin. Navçên din jî talan kirin û weha berê xwe da Hekarî û Wanê û bi talanê çû aliyê Kafkasya.

Têmurleng lawê xwe Celaledîn Miran Şah wek waliyê Kurdistan tayîn kir. Lawê wî ji wî bi xwe di aliyê zilmê de ne kêmtir bû. Hinek navçeyên Kurdistanê ku li ber vê hêza biyanî serê xwe hilda bi ser ne ketin. Ji ber vê yekê Têmurleng bi xwe di sala 1401 de veşariya Kurdistanê û qetlî-ameke mezin kir. Li Kurdistanê bes navça Bedlîsê ji zilma Têmurleng xelas bû bû. Ev jî, ji ber ku şerafedînê Bedlîsî sadiqîya xwe pêşani Têmurleng kiri bû.

Di sala 1405 de Têmurleng dimre. Amirê Karakoyunluyan ku xwe ji tirsê Têmurleng veşarti bû çû ba şerafedînê Bedlîsî û arîkarin jê xwest. Wî, li cem arîkarinê keça xwe jî dayê ku Amirê Karakoyunluyan Yusuf dewleta xwe ji nuh ve saz bike.

Lê di sala 1431 de lawê Têmurleng Şahreş Mirza dest bi êrîşên li ser Kurdistanê kir. Lê wek her car pir' ji amirên Kurdan çûn ba wî û sadiqîya xwe dan zanîn. Di nav van amiran de, şerafedînê Bedlîsî, Amirê Hekarî Ahmed, ê Hasenkêfê Amir Xelîl hebûn.

Di vê navberê de dewleta Akkoyunluyan çê bû. Dewleta Karakoyunluyan xera kir û dest bi şerrê Kurdan kir.

Di demeke kurt de piraniya navçên Kurdistanê îşgal kir û xist bin hakimiyeta xwe. Ne ku hêza hikumdarê dewleta Akkoyunluyan ji ya Kurdan pir'tir bû. Akkoyunlu yek hêz bûn, lê Kurd parçe parçe bûn. Li hemberê dijmin hevûdu ne digirtin. Uzun Hasan, amirê dewleta Akkoyunluyan merîvekî pîr xapnok bû. Wî Kurd pîr bi hêsanî di ber hev da dirakirin û şer' di nav wan de derdixist. Eşfrên Dumîlî û Dembilî ku hev pir' êşandin du mîsal in ji bo vê yekê.

Safewî dikevin holê

Paş ku Şah Ismaîl hat serê dewleta Safewîyan dest bi êrîşê Ermenîyan û Akkoyunluyan kir. Bi karakoyunluyan re dostanî girêda ku karibe êrîşên xwe berdewam bike. Li ser cihê ku êrîş dîkir, talan û kuştin dibûn. Paş ku Şah Ismaîl navçên Ermenî û ên Akkoyunluyan talan kirin dest bi êrîşên Kurdan kir. Safewî şif bûn û ji ber vê yekê ji Kurdan aciz bûn. Zilma ku wan li ser Kurdan dîkir ji ya hêzên din mezintir bû. Eger em nişekê ji bo vê yekê bidin, paş zilm û talana ku Safewîyan kir, ll amirên Kurd çûn ba Şahê Safewîyan ji bo ku sadiqbûna xwe jê ra bêjin û vê talan û zilmê rawestîne. Lê Şahê Safewîyan, Ismaîl ev her ll amirên Kurd avêtin zîndanê. Ev amirên Kurd 3 salan di zîndanên wî da man. Di cihê van amiran de Şah Ismaîl waliyê şif tayînê nava Kurdan dîkir. Di şerrê amiran de Şah Ismaîl waliyên şif tayînê nava Kurdan dîkir. Di şerrê Çildêranê (1514) de ku dewleta Safewîyan qels bû û ya Osmaniyan bi ser ket ew her ll amirên Kurdan azad bûn û veşariyan cihên xwe. Ji ber ku Osmaniyan di navçê de dîxwest ku di cihê şif de sunftiyê bexin nava Kurdan. Kurdan ev fîrset bikar anî. Idrîsê Bedlîsî li cem Osmaniyan bi awakî xweş dihat qebûl kirin. Ji ber vê yekê jî Osmaniyan di vê demê de weha zilmeke mezin li ser Kurdan ne kir.

Lê, Siltan Selîm ji Kurdan leşker di-da saz kirin ku di hemberê Safewîyan de karibe şer'ekî xurtir bike. Idrîsê Bedlîsî ev yek pêk anî û ji Kurdan hêzeke pir' mezin saz kir. Şerrên ku

di navbera Osmanî û Safewîyan de çê-
di bûn tev li axa Kurdistanê bûn. Ji
ber vê yekê Kurdan hem ji can û malê
xwe dibûn, û hem jî ji bo hêzên xerîb
şer' dikir. Amir, Beg û girgirekên
Kurdan di vê navberê de di cihê ala
xwe da ala Osmanîyan bilind dikir. Ev
jî bi kêfa Siltanê Osmanîyan dihat.

Di arîkariya Siltanê Osmanîyan de
Idrîsê Bedlîsî rokeke pîr' mezîn di-
lîst. Ji ber vê yekê Osmanîyan ew
giringtirîn kes li Kurdistanê flân
kiri bûn. Paş ku di şerrên hember
Iranîyan de hêzên Kurdan arîkarineke
pîr mezîn dan Osmanîyan, Siltan Se-
lîm, 17 alên Osmanî û 500 hedîgar jî
begên Kurdan re rê kirin. Ev hedîgar
hatin ba Idrîsê Bedlîsî û wî ev he-
dîgar belav kirin. Cidayî vê yekê
jî, ji Idrîsê Bedlîsî ra, 25.000 zêr
hatin rêkirin.

Ji ber ku Kurd sadiq man û ku ji bo
dewleta Osmanîyan bi can û mal şerr
dikir, Osmanîyan ev maf dan Kurdan:

- 1- Parastina beglikên Kurdan yê n girêdayî dewleta Osmanîyan.
- 2- Begîti û amirtî wê ji bav çê kur. Lê hemî tişt, biryar û ferman di bin destê Padîşahê Osmanîyan de ye.
- 3- Pêwîst e ku Kurd di hemî şerran de arîkarina Tirkan bikin.

4- Tirk jî wê arîkarina Kurdan bikin eger hin hêzên biyanî êrîşî Kurdan bikin.

5- Pêwîst e Kurd vergiya (bêş) xwe bê kêmasî bidin Osmanîyan.

6- Ev levhatin di navbera Siltan Selîm û Emirlikên Kurd de hatiye çêkirin.


Ev levhatin di sala 1514 de çêbûye.

Ji bo ku hakimiyeta navçê xwestir bibe, Şêx Idrîs Diyarbekr kir 19 sencak. Li Urfa û Mûsilê jî eynî tişt kir.

Di vê dewrê de Idrîsê Bedlîsî kari bû piraniya Kurdan bike yek û hêzeke bi qewet saz bike. Wî dikarî hînga dewleteke Kurdan bi vê hêzê saz ke. Ji ber ku ew di wê demê de ji aliyê piraniya Kurdan bi qedr û qîmet dihat dîtin. Lê wî ev yek ne kir û girêdayî Siltanê Osmanîyan ma. Di Cihê ku welatekî jî bo gelê xwe biparêze, welatê xwe bi xwe, bi gelê xwe bi xwe, ji bo hêzeke biyanî, dewleta Osmanîyan diparast. Wî hem gelê xwe û hem jî welatê xwe ji bo Osmanîyan pêşkeş kir.

V.S.: Di jimara bê de em nama ku Siltanê Osmanîyan Selîm, ji bo Idrîsê Bedlîsî re şandi bû çap dikin.

Dûmahî heye




Siwarên Kurd

Elisée RECLUS

Nouvelle Géographie Universelle, la Terre et les Hommes, Paris 1884

HEVPEYVÎNEK BÎ DR. QASIMLO RE



Berê çend heftan, Dr. Qasimlo, sekreterê giştî yê P.D.K. Îranê, hati bû Belçîka û di teleyizyona flamanî de peyivî bû. Têkoşer jî vê ziyaretê kar kir ji bo ku ji Dr Qasimlo çend pirsan bipirse:

Pirs: Rewşa Kurdistana Îranê ya rêzanî (siyasî) çawa ye?

Bersiv: Li Kurdistana Îranê ev çend sal e şerr e. Hûn dîzanin ku li dijî rejîma Xumeynî em karin şerr bikin. Ev ne tiştekî mezin e. Di nav dewleta Îranê de em otonomiyê dixwazin. Li Ewropa, ji me dipirsin: "Hûn çi dixwazin?". Em dibêjin: "Em otonomiyê dixwazin". Ji me re dibêjin: "Çawa ji bo otonomiyê hûn şerr dikin?". Felsefa Xumeynî otonomiyê qebûl nake. Dilxwaziya me ji bo Îranê Dêmkirasî, ji bo Kurdistana Otonomî ye. Lê li cem Xumeynî ne dêmkirasî heye û ne otonomî. Dîsa me ne dixwest em şerr bikin. Lê Xumeynî dijî me şerr ilan kir, li cihanê. Şer mehan me muzakere bi Ayatullahan re kir. Lê, wan ne xwest tu heqekî me bidin. Ev çend sal e em şerr dikin; rewşa me ne xerab e. Bi tenê li Kurdistana Îranê em karin li hemberî Xumeynî şer bikin. Bajara bi roj di destên wan de ne, bi şer di bin kontrola me de ne.

Çiya û gund di bin destên pêşmergan de ne. Ez bawer im ku emê heqê xwe bistînin.

Pirs: Têkiliya Partiya we bi rêzanên din re çawa ye?

Bersiv: Rêzana Kurdistana Îranê ya mezin Komele ye. Ew xwe marksîst-lênîst dibêje. Em pê re xebatê dikin. Carina ne xweşî di nav bera me de çêdibin, lê em nahêlin mezin bibin. Em karê xwe bi hev re dewam dikin. Grûpên din ên biçûk hene, ji Îranê hatîne nav me. Bi mêvanî li cem me dimînin, ji bo ku li wan cihên din rê ji wan re tu neye. Bîr û baweriyên me ne yek in, lê dîsa jî em bi mêvanî li wan dinêrin. Bi rêzanên din ên Iraqê, ên Tirkîyê re dan û stendinên me xweş in. Hin hêne jî ne rêzan in, eşret in. Kurên Barzanî li gel Xumeynî ne. Em naxwazin bi wan re şerr bikin, lê ew dijî me şerr dikin. Em dibêjin em otonomiyê dixwazin, lê belê mana vava ne ew e ku heqê me ji bo serxwebûnê tu neye. Çawa Kurdên Tirkîyê û Iraqê heqê wan ji bo serxwebûnê heye, ew heq ji bo me jî heye. Eger em diyin alfkariya gelê Salvador bikin ku ew bigihêje heqê xwe, çawa em vava ji bo Kurdên Tirkîyê û Iraqê nexwazin? Di eksê wî de, daxwaziya

mê gelek e. Em dixwazin alfkariya Kurdên Tirkîyê û Iraqê bikin. Lê di-
sa jî em naxwazin têkiliya karên wan
û ew jî têkiliya karên me bibin.

Pirs: We xwe çawa da pejirandin (qe-
bûl kirin) li Kurdistanê Îranê?

Bersiv: Partiya me ne partiyeke ci-
wan e. Sala ku bê ewê partiya me bi-
be 40 salî. Wê, di dema Komara Maha-
badê de û piştî wê tecruba xwe kiri-
ye. Wê karê xwe di zemanê Şah de ki-
riye û di şeş salên piştî Şah de jî
me xebata xwe ne sekinandiye. Partî,
her gav, li daxwaziya xelkê guhdarî
kiriye û li gora daxwaziya gel meşi-
yaye. Helbijartin çêbû. Partiya me
ji dengên (rayan) %85 û di cihne de
%90 wergirtin.

Pirs: We çawa çasên ku di nav we de
ne anîn rê?

Bersiv: Pirs çasên pirseke tarîxî
ye. Dijminê me jî wan her gav istifa-
de kiriye. Li Kurdistanê Îranê, nis-
beta çasên kêmtir e. Piştî pênc sa-
lan ew pirr kêmtir bûn. Ji bo çî yek
dibe ças? Yan jî nezaniyê, yan jî a-
liyê siyasî kêmtir e, ya feqîr e jî bo
pere dike. Ças xeterekî mezin e, jî
bo ku ew riyên Kurdistanê û cihan
pirr baş nas dikin, rê nîşanî Pasda-
rên Xumeynî û dijminê me dikin û alf-
kariya wan dikin. Go ças bikevî des-
tê me, em zû bi zû wan naberî. Ên
ku carek dibin ças û poşman dibin, em
cih didin wan, lê ne du caran.

Pirs: Pirs mezintirîn çî ye li Kur-
distanê Îranê?

Bersiv: Em jî bo otonomiyê şer dikin.
Ji her tiştê bêtir, jî me re pere û
çek pêwîst e. Lê, heta nuha, çekên me
hene, lê perê me nîne. Ew jî me re
pirr pêwîst e. Xebata me pirr dûr û
dirêj e. Ji bo me pirsê stratejîk, li
hundur yan li derva be, pirr giring e.
Li derva, pêwîst e em bala xelkê bi-
kişînin pirsê Kurdistanê û jî wan
piştgirtiyê bixwazin. Ji me hê jî
em jî hikûmetên wan alfkariya maddî
û manewî wergirin baş e. Ji me re
organîzasyon pirr muhim e. Go orga-
nîzasyon, pere û çekên yekî hebin,
tu tişt xwe li ber meriv nagire. Lê
çek û pere nebin zor e. Berî hemî
tiştî, organîzasyon jî bo hemî xe-
batê gelekî pêwîst e.

Pirs: Em zanin ku hûn otonomiyê jî
bo Kurdistanê Îranê û Dêmkirasiyê
jî bo Îranê dixwazin. Sebebê vava
çî ye?

Bersiv: Tecruba me di tarîxê de nî-

şanî me dide û em zanin quweta me
çî ye, weka Kurdên Îranê. Li Kur-
distanê Îranê ku heqê me federalî be
em fêdêralîzmê dixwazin. Lê, jî ge-
lên Îranê yê din kesek fêdêralîzmê
naxwaze. Hin jî wan jî otonomiyê na-
xwazin. Ez bawer im ku jî bo neslê
me jî Kurdistanê re otonomî, jî Î-
ranê re dêmokrasî dibe. Ji bo neslê
ku ewê bê dilxwaziya wî fêdêralîzm
û serxwebûn be, çî dibe, ew daxwa-
ziya wî ye. Partiya me jî 1971 de,
di bernama xwe de jî bo otonomiyê
xebat dike. Em nuha bêtir naxwazin.

Pirs: Li ser şerrê Iraq û Îranê di-
tina we çî ye? Rewşa we çawa ye?

Bersiv: Em dijî şerrê Iraq û Îranê
ne. Zor kes hatine kuştin. Ev şerr
li Kurdistanê jî dibe. Wan Kurdis-
tanê wêran kir, bi bombe û topên
her du aliyan. Ev şerr ne şerekf baş
e. Em aşîtiyê dixwazin. Zor kes di-
bêjin ku aşîti çêbibe ewê jî Kurdan
re ne baş be. Lê, ev ne rast e. Hin
dibêjin ku aşîti çêbibe, Xumeynî ewê
bêtir leşker bişîne Kurdistanê. Ez
difikirim ku ew nikare zêdetir leş-
ker bişîne Kurdistanê Îranê. Cih bê-
tir tune. Sed hezar sed hezar in,
du sed hezar du sed hezar in. Bêtir
cih nagrin. Paşê firoke û tank li
Kurdistanê bi kar nayên û kar nakin.

Pirs: Eger şerrê Iraq û Îranê rawe-
ste, ewê rewşa Kurdistanê çawa be?

Bersiv: Eger şerrê Îran û Iraqê ra-
weste, dibe ku Xumeynî bêtir leşker
bişîne Kurdistanê. Lê, heta ku Cum-
hûriyeta Islami heye, dostanî bi I-
raqê re çênake. Çêbike jî, belkî li-
heyhatinekê çêbike. Weka berê, ew
tiştêkî mezintir çênake jî. Çiyayên
Kurdistanê hene û pêşmerge tê de se-
kinîne û em di gelê xwe bawer in.
Şerrê me pêş şerrê Îran û Iraqê çê-
bûye, li hemberî rejimê Xumeynî.

Pirs: Çima Xumeynî dixwaze şerr de-
wam bike?

Bersiv: Xumeynî dixwaze şerrê Cumhû-
riyeta Islami "exporte" bike. Ew jî
felsefa islami ye. Eger rojek hat ku
Xumeynî şerr nexwaze, wê çaxê ew
felsefa xwe inkar dike. Sebebên din
ku Xumeynî naxwaze şerr rawestîne:
pênc şeş milyon bêkar hene. Ew jî
wan re dibêje bira şerr raweste; 2,5
milyon awareyên şerr hene, tiştêkî
wan tu neye, mal û cihê wan tu neye;
1,5 milyon Afganî hatine, kar dixwa-
zin, cih dixwazin. Karkerên Îranê
heqê wan jî zemanê Şah pirr kêmtir
e. Herkes çî bixwaze, jê re dibêjin
raweste, nuha şerr e, bila şerr bi-

KONSERA KURDÎ-TÏRKÎ LÎ BRUKSEL

Konsera ozanên binay û deng, yê gelên Kurd û Tirk, di bin navê "Stranên me Dost in", di 24 mijdare de, li Bruksel, bi awakî şad hat saz kirin.

Tevî koma muzîkê, Şivan Perwer û Melike Demirag, berê ku bîn Bruksel, li Elmanya jî stranên şoreşgêrî û geleri pêşkeş kiri bûn. Ev konser ewê li welatên din ên Ewropa bê çêkirin.

Li Belçîka, di konsera ku Têkoşer saz kir, nêzîkî 600 kes beşdar bûn şevê. Kurd, Tirk, Ermenî, Suryanî, laz û Belçîkî gihan hev û biratiya gelan nîşan dan. Bi her parçêke stranên re civakî şah dibû û bi ozanan re distira.

Koma muzîkê bi awakî pirr xweş lêdixist û konserê delaltir dîkir. Di eynî zemanî de jî, diaposîtîv hem Kurdistanê û hem Tirkiyê nîşan didan û li ser wan wergerandina (tercûme) stranên bi îngilîzî xuya dibû. Hevaleke me ya belçîkî jî wergerandinê bi zimanê fransîzî, bi mîkro, dîkir.

Strana ku Melike û Şivan bi hevra distira "Dostno merheba", stranên Şivan "Kîne em?", "Canê Canê", "Xe-


zala Çiyayê Şingalê" û strana nuh li ser şoreşa azadiyê li çiyayê Agirî "Agirî"....., li cem stranên Melike, "Ellerimiz", "Isimsiz Kahramanlar", "Gelecek Günler", civakê di şahîyeke mezin de hişt.

Her du ozanên mezin çend stranên geleri hem bi Kurdî û hem bi Tirkî bi hevra digotin. Melike her cara ku stranek geleri yan bi Şivan ra yan jî bi tenê distira, û eslê wê stranê kurdfî ba jî guhdaran ra dida zanîn ku ev stran jî kurdfî hatiye kopye kirin. Vê yekê jî konserê bêtir xweş dîkir.

Bi kurdfî, konsera Bruksel jî aliyê sazîkirinê û naverokê bûyereke pirr hêja bû. Ev konser dostanî û biratiya ku di nav gelên me de mimkin e nîşan da.

Herkes xwediyê şexsiyet û hebûna xwe, bê ku çandên kurdfî û tirkî tevliheviyê bibin, bi çîranetiya dîlpak û bi bîratî.... Hemî yan şifetan di vê şevê de xuya dîkir. Em hêvî dikin ku ew her dem saz bibin.

Televîzyona belçîkî, beşê fransîzî, beşdarî vê konserê bû û ewê roja şemiyê, 29.12., saet 12.30-13, vê şevê nîşan bide.



BRÜKSEL 'DE KÜRT-TÜRK KONSERİ

Kürt ve Türk halklarının meşhur devrimci halk ozanları Şıvan Perwer ve Melike Demirağ'ın "Türkülerimiz kardeştir" adını taşıyan konseri, Kasım ayının 24 ünde Brüksel de coşkuyla verildi.

Şıvan Perwer ve Melike Demirağ müzik guruplarının eşliğinde Almanya'nın çeşitli kentlerinde de devrimci türkülerin yanında, halk türkülerini de içeren müzik konserlerini vermektedirler. Kürt, Türk, Ermeni ve diğer milliyetlerden de işçilerimizin kitlesel olarak dinlediği bu konserler, çeşitli Avrupa ülkelerinde de düzenlenmektedir.

Belçika'da Têkoşer'in organizasyonunu yaptığı konser Kasım ayının 24 ünde Brüksel de düzenlendi. 600 den fazla bir kitlenin izlediği bu konserde, Belçikalısı, Kürdü, Türkü, Lazı, Ermenisi ve Süryanisi büyük bir ilgiyle izledi, Dayanışmada bulunarak halklarının kardeşliğini gösterdi, çalınan her parça halkların yaşamının bir parçası olduğundan kitle coşuyordu.

Müzik gurubunun ozanlara ustaca e'lik etmesi, gerek Kürdistan ve gerekse Türkiye'den manzara içeren, diya-pozitifler, çalınan parçanın İngilizceye tercüme edilmesi ile birlikte gösterilmesi, Türkçe ve Kürtçe anlamayan diğer dinleyicilerin programı anlamalarına yardımcı oluyordu. Bunun yanında, direk olarak Fransızcaya mikrofon ile tercüme yapılıyordu.

Melike Demirağ ve Şıvan Perwer'in birliktede


söyledikleri " Dostlar Merhaba " Şıvan'ın kitleler tarafından büyük ilgi toplayan " Kine Em, Canê canê, Xezala Çiyayê Şingalê Yeni bestelediği ; Ağrı dağındaki özgürlük isyanı parçası " Agirî " ve çeşitli halk türkeleriyle; Melike Demirağ'ın söylediği parçalardan " Ellerimiz, İsimsiz Kahramanlar, Gelecek Günler " ve çeşitli halk parçaları, seyirci kitlesini şaha kaldırdı. Halk türkülerinin bazılarını da beraberce söyleyen ozanlarımız, kürtçelerini ve türkçelerini karşılıklı çalıyorlardı.

Halk türkülerinin söylendiği sıralarda Melike Demirağ Türkçe söylediği türkülerin bir kısmının Kürtçe olduğunu bizzat vurgulayarak bunun farkına daha sonra vardıklarını söyledi. Karşılıklı söylenen türküler geceye ayrı bir renk katıyordu.

Sözün kısası Brüksel'de düzenlenen "Türkülerimiz Kardeştir " konseri organize ve içerik bakımından güzel bir şey idi. Bu konser halkların arasında dostluk ve kardeşliğin vazgeçilmez olduğunun ıspatı idi.

Hiç bir kültürün diğer bir kültürün içinde eritmeye kalkışmadan eşit değerlerle yan yana herkesin kendi benlik ve özdeğerlerini koruyabileceği bir şekilde dostluk ve kardeşlik için bir örnekti. Şıvan ve Melike'nin konseri ümidimiz oki bu kardeşlik ergeç gerçekleşecek.

Adı geçen konser 29 Aralık 1984 tarihinde RTBF-1 Liège televizyonunda yayınlandı.



SERBUHURIYEK BI YILMAZ GÜNEY RE

Tori

Di têkoşîna guhertina dinyayê de her şaxê hunermendî destkarekî hêja ye. Bi wan destkaran hunermendî hizirê "düşünce" xwe, tewrgotinê "yorum" xwe î li guhertinê digihêjênin kom-netewoka.

Begoman sinema jî yek ji wan destkara ye û ji firça wênekara, ji qelma nivîskara, ji ber ko digihêjî gelek kesa, hêj diwartir e. Yilmaz Güney ger bi pirtûkên xwe, ger bi film û seneryoyê xwe hunermendekî hêja bû û weke her hunermendê pêşverû, di guhertina dinyayê de cihê xwe girti bû û hunermendîya xwe bi piranî bi sinema pêk tanî û di vî warî de, bê miqeresî xwe dabû peji-randin. Navê xwe li tev welatan dabû bihîstandin.

Weke her hunermendî, rêçikke hunermendîya Yilmaz Güney hebû. Pêşî rêzaniya çîniya karkeran, cohtkaran rêçikandi bû. Di filmê xwe de cih dabû kesên vê çîniyê. Piştra, berê qemera xwe vegerand ser Kurd û Kurdistan.

